Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1362 | 25-Adar-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Ji firoşgehek biharatan... Kalemêrek ji bo malbata xwe hêviyek diafirîne

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Li yek ji bazarên Qamişlo, Xalid Elî Mihemed ê 60 salî li pişt firoşgeheke biçûk rawestiyaye û kîsikên sade yên biharatan bi bihayên erzan difiroşe. Tevî sadehiya karê wî, ev firoşgeh yekane rêya jiyanê ji bo malbateke mezin temsîl dike.**

Di nav kîsikên piçûk ên biharatan û bêhnên wan ên cihêreng de, Xalid Elî Mihemed demjimêrên xwe yên dirêj li sûkê derbas dike. Çar sal berê, piştî ku debara wî kêm bû, wî biryar da ku vê karsaziya hêsan dest pê bike, û firotina biharatan kir çavkaniya yekane ya dahatê ji bo malbatek deh kesî.

### Destpêka karê wî

Li yek ji kolanên bazara populer a bajarê Qamişlo, bêhna kîmyon, îsot û kêzikê li hewayê belav dibe, hebûna firoşgehek biharatan a biçûk radigihîne ku li pişt wê zilamek ku ji şêst salî mezintir e, Xalid Elî Mihemed, ku di sala 1959"an de li gundê Hecî Kebîr, ku girêdayî bajarê Qamişlo ye, ji dayik bûye û ji bo wî firotina biharatan bûye rêyek ji bo debara jiyanê û dabînkirina jiyanek baş ji bo malbata wî.

Mihemed roja xwe zû dest pê dike, berî ku bazar bi kirrûbiran tijî bibin. Ew kîsikên biçûk ên biharatan hildigire û wan bi baldarî li ser dikana xwe ya sade rêz dike. Ew piştrast dike ku dikan



tevî sadehiya xwe xweşik xuya dike, ji ber ku ev yek dibe ku bêtir xerîdarên ku li biharatan bi bihayên maqûl digerin bikişîne. Her kîsik 50 gram giran e û ew wê bi sê hezar lîreyên Sûrî difiroşe, lê cûreyên din ên kîsên biharatan heta çar hezar lîreyên Sûrî ne. Ev biha pir hêsan xuya dikin, lê ji bo Mihemed ew ferqa di navbera rojek baş û rojek dijwar de temsîl dikin. Xalid Elî Mihemed got: "Ew dikana ku ez lê biharatan difiroşim yekane çavkaniya dahatê ye ji bo malbata min a ji deh kesan. Bihayê jiyanê yê bilind û kêmbûna hêza kirîna mirovan firotina biharatan dike karekî dijwar ku gelek sebir û berxwedanê dixwaze."

### Dabînkirina debara jiyanê

Tenê çar sal berê, Mihemed hêvî nedikir ku li pişt firoşgehek biharatan li sûkê raweste, lê şert û mercên dijwar ên aborî û nebûna derfetên kar ew neçar kir ku li her karekî bigere ku bikaribe bi riya wê debara malbata xwe bike. Piştî gelek ramanan, wî biryar da ku bi vê firoşgeha piçûk dest pê bike, ji ezmûna xwe ya hêsan a firotina berhemên xwarinê sûd werbigire.

Di destpêkê de ne hêsan bû, ji ber ku bazar tijî firoşkar bû û reqabet dijwar bû. Lêbelê, Xalid Mihemed bi saya muameleya xwe ya baş û pabendbûna xwe ya dabînkirina biharatên bi kalîteyek maqûl bi bihayên maqûl karî baweriya hin xerîdaran bi dest bixe. Her çend dahata wî ya rojane roj bi roj diguhere jî, Xalid Alî Mihemed hewl dide ku geşbîn bimîne. Hin rojan ew mîqdarek baş ji biharatan difiroşe ku dihêle ew pêdiviyên bingehîn ên malê bikire, lê rojên din ew bi zorê lêçûnên hêsan peyda dike.

### Hêvî tevî zehmetiyan

Ji bo Xalid Elî Mihemed, jiyan ne tenê hejmar an qezenc e, lê berpirsiyariyeke mezin e li hember malbata wî. Deh kes hene ku bi tevahî xwe dispêrin wî, ev yek jî dihêle ku ew her sibeh dema ku derdikeve bazarê giraniya berpirsiyariyê hîs bike. Tevî westandin û salên dirêj ên derbasbûyî jî, Mihemed hîn jî bi hêviyê ve girêdayî ye: "Kar, çi qas hêsan be jî, ji bêkarbûnê çêtir e, û rûmeta rastîn di hewldana qezenckirina debara bi awayekî rast de ye."

Di dawiya rojê de, Mihemed kîsikên biharatên mayî berhev dike û dikana xwe digire, dû re vedigere malê ku malbata wî li wir li benda wî ye. Dibe ku ew pir pere negire, lê tiştek girîngtir ew hildigire, hestek ku wî her tiştê ku ji destê wî dihat kiriye



da ku jiyanek çêtir ji bo malbata xwe peyda bike. Dikana biharatan a biçûk her roj şahidê çîroka têkoşîna zilamekî ye ku bi xebat û sebirê bi zehmetiyên jiyanê re rû bi rû maye. Di navbera kîsikên asîda sîtrîk û bêhna biharatên cûda de, Xalid Elî Mihemed ê şêst salî beşek nû di çîroka zilamekî sade de dinivîse ku hewl dide malbata xwe ji dijwarbûna şert û mercan biparêze.

Û bi vî awayî çîroka Xalid Elî Mihemed, firoşkarekî biharatan li bazara Qamişlo, berdewam dike û îspat dike ku xebata herî hêsan dikare veguhere çîrokeke têkoşîn û berxwedanê dema ku ji hêla tevahiya malbatekê û hêviyek bêvemirandin ve were piştgirî kirin.



Bi kamîreya Ayşa Silêman

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER XIRABBÛNA REWŞÊ YAN TIŞTEKÎ**

**Aşbetal e:**
- Her tişt xirab bû; nexşe tev ketin avê.

**Dîwarê wî herifî:**
- Jiyana wî tevlîhev bû; jiyana wî xirab bû; her tişt ji destê wî derket.

**Dolava wî çep geriya:**
- Her tişt ji dest çû; karê wî serûbin bû; karê wî tev xirab bû.

**Feleka wî çep geriya:**
- Jiyana wî tevlîhev bû; jiyana wî xirab bû; her tişt ji destê wî derket.

**Felek li serê wî geriya:**
- Perîşan bû; tiştek nema ku nehat serê wî; ya nemayî hat serê wî.

**Kevir li ser kevir nema:**
- Wêran bû; xirab bû; tiştek li ser hev nema.

**Kevirê wî qulibî:**
- Şansê wî berûvajî bû; rewşa wî têk çû; rewşa wî serûbin bû.

**Kuçê wî qulibî:**
- Jiyana wî tevlîhev bû; jiyana wî xirab bû; her tişt ji destê wî derket.

**Kul ji wan re hatiye:**
- Deng ji wan nayê; xuya nakin; ewqas em li wan digerin em wan nabînin.

**Kul ketiye nava wan:**
- Bi heman wateyê.

**Kulê li wan daye:**
- Bi heman wateyê.

**Kul ket mala wî:**
- Mala wî wêran bû; mala wî xirab bû.

**Kund li ser dixwînin:**
- Wêran bûye; ti kes tê de nemaye.

**Li derziya diya xwe hesilî:**
- Tiştek jê re nema; rewşa wî pir xirab bû; hewcedarî tişta herî piçûk û bêkêr jî bû.

**Robiro xwezî bi do:**
- Her ku diçe xirabtir dibe; berê baştir bû.

**Salbisal xwezî bi par:**
- Bi heman wateyê.

**Serê çov gemar, binê çov gemar:**
- Tu çawa bikî nabe; di her alî de xirab e.

**Stûna wî ket:**
- Rewşa wî têk çû; berê wî qulibî; dema wî borî; jiyana wî ya berê nema.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Nameyên pîrozbahiya Newroza 2026'an: Banga xurtkirina yekîtî û aştiyê



Pîrozbahiyên Newrozê li çar aliyên Kurdistanê û gelek deverên cîhanê bi beşdarbûna bi hezaran hat pîrozkirin û hîn jî tê pîrozkirin. Newroza îsal çoşa xwe ji salên çû, hîn zêdetir û mezintir hat pêşwazîkirin û tê de gelek nameyên girîng ên ku banga yekîtî, aştî, demokrasî û hevgirtinê dikin, hatin xwendin.**R-4**

## Emîne Osê: Destkeftiyên jin ne mijara nîqaş û bazarê ne



Berdevka Komîteya Têkiliyên Dîplomasî ya Kongra Star Emîne Osê diyar kir ku ew weke rêxistinên jin yên sivîl, siyasî û leşkerî tekez dikin ku mafê jin û destkeftiyên wan ên 14 salan, ne mijara nîqaş û bazaran e.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1362 | 25-Adar-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# BI YEKÎTÎ Û XWERÊXISTINKIRINÊ AZADIYA KURDAN PÊKAN E

Rojnamevanê Kurd E. Pêjder Altan da zanîn ku azadiya gelê Kurd ne tenê di berjewendiya Kurdan de ye, lê di heman demê de di berjewendiya hemû gelên herêmê û mirovahiyê de ye. Di şert û mercên heyî yên şerê cîhanê yê sêyemîn de, bidestxistina azadiyê gengaz bûye, lê ji bo wê yekîtî û rêxistina neteweyî pêwîst in.**R-6**




## Li Qamişlo tevgera avakirin û lêkirinê geş bûye



Îsal li Qamişlo di sektora avakirinê de geşbûneke berbiçav hatiye dîtin, herwiha tevgera lêkirinê hêdî hêdî piştî demeke ji rawestandinê, dîsa vedigere. Ev yek başbûneke rêjeyî di bazara xanûberan û aramiya buhayên madeyên lêkirinê yên bingehîn nîşan dide.**R-8**

## Li Sûriyê mezheb dibin amûrê dewletên navxweyî û navneteweyî



Sûriyê welateke ku bi cihêrengiya xwe ya dînî û mezhebî tê naskirin. Ev cihêrengî dikare hem bextewariyek çandî û civakî be, hem jî di hin şertan de bibe sedema pevçûnê. Lê li Sûriyê mezheb ne sedema bingehîn a şer bû, ew bû amûrek dewletên herêmî û navneteweyî ku heya roja îro tê bikaranîn. ...**R-5**

## Êrişên Israîl-DYA li dijî Îranê, herêmê ber bi kirîzeke dijwar ve dibe



Şerê Îran û DYA-Israîl ku beriya 25 rojan dest pê kiribû bi hemû hêza xwe dewam dike û li ser Rojhilata Navîn û tevahî cîhanê bandoreke neyênî dike.**R-3**


Newroza 2026'an
Farûk Sakik R-4


Zanakirina nifşên civakî ne tenê erka mamosteyekî/ê ye
Ehmed Hesen R-7


Newroz: Roja Nû ya Gelan
Gulîstan Xalid R-10

# Emîne Osê: Destkeftiyên jin ne mijara nîqaş û bazarê ne

Berdevka Komîteya Têkiliyên Dîplomasî ya Kongra Star Emîne Osê diyar kir ku ew weke rêxistinên jin yên sivîl, siyasî û leşkerî tekez dikin ku mafê jin û destkeftiyên wan ên 14 salan, ne mijara nîqaş û bazaran e.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Jinên Sûriyê û bi taybet jinên Kurd ev 14 salan di nava têkoşîneke mezin dene, ji bo jiyaneke azad û parastina mafê tevahî jinan di nava berxwedaniyê dene. Di pêşeroja Sûriyê de û di nava destûra Sûriyê de eger parastina mafê jinê neyê kirin û were paşguhkirin wê Sûriyek azad û aştiyane ava nebe.
Di vê çarçoveyê de Berdevka Komîteya Têkiliyên Dîplomasî ya Kongre Star Emîne Osê ji Rojnameya me re axivî.

**‘Têkoşîn ji bo jiyanek azad û birumet e’**

Emîne Osê destnîşan kir ku ev 14 salin gelê Sûriyê di nava têkoşînekek mezin dene û wiha got: “Encamê vê têkoşînê xwasteke guhertina rêjîma dîktetor, di heman demê de xwasteka wan jiyanek azad û bi rumet bû. Di nava Sûriyê de taybetmendiya herêmên Kurdî hene, herêmên Kurdî di milê rêveberî û siyasî de xwe birêxistin kirin. Herwiha di milê xweparastinê de jî taybetmendiyek me ya cûda heye, guhertina rêjîmê ku çêbû di encama lihevkirina herêmê û navneteweyî, li gorî berjewendiya xizmeta sîstema desthilatdar a cîhanî bike, li ser wê esasê rêjîma Baas hate ruxandin û hikumeteke nû hate ser desthilatdariyê. Ne hikumeteke ku xwasteke gelê Sûriyê ji bo rumet û kerameta wan biparêze, lê belê hikumeteke ku careke din hişmendiya navendîbûya hişk bi zor û awayê leşkerî serweriya xwe li ser hemû xaka Sûriyê ferz bike û taybetmendiya herêman negire ber biçav derket pêş. Di encamê de, di nava salekê de bi hezaran ji gelê Kurd, Elewî li Berava Sûriyê û durzî li Siwadê hatin qetilkirin. Herwiha yê ku zêde bûne qurbaniya hişmendiya cîhadperestiyê jin bûn, hemû binpêkirin di mafê jinê de rawa dibînin.”

**‘Ji bo hikumetek nû hatina ser desthilatdariyê lekeyeke reş bû’**

Emîne Osê da xuyakirin ku di hemû komkujiyên ku hatine kirin de ranewestiyan û wiha domand: “Bi hemû hewildanên xwe yê hundîrin û derve xwastin ku tecrûbeya Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê têk bibin. Li ser vî esasî hem Şûvînîzma Erebî kirin dewrê di heman demê bi piştgiriya hikumeta demkî û istixbaratê hikumeta AKP’ê ya Tirkiya êrişê ku 6’ê Çileyê hate ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê xwastin mesajekê bidin herêmên Rêveberiya Xweser eger ku hûn teslîm nabin tenê rêya qirkirinê li pêşiya we maye, ji bo wê jî bi hejmareke zêde tang, top, leşker, çete û erebên şûvînîst ku tenê mebesta wan talan û wêrankirine berê xwe dan Şêxmeqsûd û Eşrefiyê di encamê de 4 rojên berxwedaniyek bi rumet, bi pêşengtiya heval Ziyad û Deniz hate kirin.
Li pêşiya raya gîştî a cîhanê cenazeyên sivîlan û şervanên YPJ ji avahiyan de avêtin, şewidantin û hejmareke mezin hatin dîlgirtin. Ev weke serkefitina xwe îfade kirin, lê mixabin ji bo hikumeteke nû hatiye ser desthilatdariyê weke lekeyeke reş wê di dîroka wan de bimîne, di vê yekê de sînordar neman, lê berê xwe dan herêmên Rêveberiya Xweser, di gelek herêman de Rêveberiya Xweser hewildan ku xwe ji şer dûrbixînin û di nava herêma de şerê navxweyî çênebe û nebe şerê Kurd û Ereban li ser vê esasê ji herêmên Reqa, Tebqa, Dêrezor û hwd vekşiyan û hêzên QSD’ê nexwastin têxin şerekî bi vî awayî. Lê mixabin li hember xwasteka wan rêzdarî û pîvanê şer nehatin esas girtin, dîsa careke din kuştin, dîlgirtin û pêla şûvînîzma Erebî li ser mal, milk û gundên Kurdan li ber bi çav hatin kirin. Li hember van êrişan helwestê gelê Kurd gelek xort bû, hem li Rojava û sê parçeyên din ê Kurdistanê di milê siyasî û xwepêşandanan de gelê Kurd weke mijarê hebûn û tunebûnê dîtin. Eger gelê Kurd bê deng maba, wê carekedin di dîrokê de qetilama li ser Kurdan dûbare bibe yan jî wê li berxwe bidin û şer rawestînin. Helwesta gelê Kurd ya netewî hişt ku ev êriş rawestin.”

**‘‘Di nava guhertinên ku di Sûriyê de çêdibin jin nayên dîtin’’**

Emîne Osê tekez kir ku di bin zexta helwesta gelê Kurd de lihevkirina 29’ê çileyê hate îmza kirin û wiha pê de çû: “Ev lihevkirin di bin zexta yan qirkirina ya teslîmiyet bi vî awayî hikumeta demkî bi piştgiriya hêzên navneteweyî bû. Niha pêvajoya entegresyonê heye, lê di nava vê pêvojoyê de hewildidin ku taybetmendiyên herêmên Kurdan ra bikin, zimanê Kurdî weke zimanê fermî girtina dest ne tenê di destûra ku hikumeta demkî derxistî ku 2 seatan bi hilbijartin were xwandin, mafê gelê Kurd ne tenê komîteya ku niha niqaş dike di encamê de konferanseke neteweyî çêbû, komîteyek derket ku maf û doza gelê Kurd sereke bê girtin, di nava encamnameya konferansa netewî de jin û ciwan weke perensîbê me yê sereke de di nava hemû guhertin û veguhertinên ku di Sûriyê de çêdibin ciheke wan ya taybet hebe. Lê di nava hemû guhertinên ku di Sûriyê de tên çêkirin, em weke jin dibînin ku paşguhkirina rola jin heye, destgeftiyên jinê ya 14 salan ji nedîtî ve tên dîtin, di haman demê de hemû destkeftiyên jin heya niha em tu gerantiyê nabînin.
Me di raghandina destûrê Sûriyê de dît ku tu cihekî taybet ji jinê re nehat dîtin. Di hemû zagonên ku derketine de jin hatiye paşguhkirin heta ku neheqiya li ser jinê tê hêzkirin. Ji bo vê yekê em weke kongre Star xwedî tecrûbeya sala, bi hemû rêxistinên jinan ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê re konferansek liderxist ku jin di nava entegresyonê de wê çawa be, di nava qada de rewşa wê çawa be, çi erkan bigire û hejmara wan wê çiqas be di heman demê de di milê siyasî de wê rola jin çi be, di mijara destrûra ku were nivîsandin de wê hebûna jin, pênasekirina mafê jinê bi dest û hişmendiya xwe wê çawa be. Pêwîste di pêşerojê de taybetmendiya jin di zagon û destûre de



were pênase kirin ku jin bikaribe di hemû qadê avakirina Sûriyek demokratîk de xwedî rolek be ev ji bo me gelek girînge.”

‘Mafê jinê ne mineteke ku kes bi xêra xwe bide me’

Emîne Osê axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Di Mijara parastin û hêza jin de, ji ber ku li hember hişmendiya cîhadperest û netewperest ne mûmkîne ku em baweriyê bidin ku jin bê parastin bimîne. Eger hêzê me yê parastinê xwedî cihek rawa di nava artêşa Sûriyê de nebe, ev mijar girînge ku me di kanferansê de niqaş kir, encamê ku ji vê konferansê derkevin wê weke dosyeke li hemû rêxistinên jinan were belavkirin û li ser vê esasê têkoşîna xwe ya rawa bikin heya ku mafê xwe di pêşeroja Sûriyê de misoger bikin. Gelek girînge û divê wê pêvajoya ku jin niha tê re derbas dibe qebûl û neslîm nebe, hemû hewildanên xwe di milê siyasî, destûrî û xweparastinê de xwedî cihekî ber bi çav be. Yekîneya parastina Jin ku bala hemû cîhanî kişand ser xwe ji bo xwasteke pêşroja Sûriyê şoreş kirin, ne mumkine ku em vana di koşeke dîrokê de bihêlin û bal nekşînin ser û ji bo misogerkirina van di destûrê de em dest jê berdin.
Em weke rêxistinên jin yê sivîl, siyasî û leşkerî tekez dikin ku mafê jin û destkeftiyên jin a 14 salan me bi dest xistî ne mijara niqaş û bazara ne. Herwiha mafê jinê ne mineteke ku kes bi xêra xwe bide me, mafê ku em bi hêz, hevgirtin û dest xwe bidest bixin. Di heman de mafê me ne zilam bi hişmendiya xwe pênase bike, em jin mafê xwe di zagona rawa de ya ku di demê pêş de derkeve em xwe bi xwe pênase bikin, herwiha komîteyê destûrî yên ku çêbibin beşdarbûna jin, misogerkirina maf û taybetmendiyên jin em girîng dibînin, mebesta me ji kanferansa ku hat lidarxistin evin.”






# Li Sûdanê kirîzên mirovî tên jiyankirin

Ji destpêka şerê Sûdanê ve rewşa mirovî ber bi xeteriyeke mezin ve çû. Li gorî raporên navneteweyî dewamkirina şerê Sûdanê bûye sedema hilweşîna pergala xizmetguzariya dewletê û têkçûna sektorên tenduristî, perwerde û xwarinê, ji ber wê hewcedariya bi milyonan kes bi alîkariyeke mirovî ya lezgîn heye.

**Navenda Nûçeyan**

Şerê li Sûdanê êdî nema tenê pevçûnek siyasî an leşkerî di navbera aliyên dijber de ye, lê belê bûye yek ji krîzên mirovî yên herî aloz û xirab ên cîhana hemdem. Her ku pevçûnên çekdarî berdewam dikin, bi milyonan welatiyên Sûdanê rastiyek bi êş dijîn ku di koçberiya girseyî, hilweşîna xizmetguzariyên bingehîn û berfirehbûna birçîbûnê de xwe nîşan dide, di rewşekê de ku civaka navneteweyî dixe ber ezmûneke rastîn a exlaqî û mirovî.



**Karîseta mirovî mezintir dibe**

Ji destpêka şer ve, Sûdan ketiye qonaxeke bêhempa ya xirabûna rewşa mirovî. Texmînên navneteweyî nîşan didin ku bi deh milyonan mirov ji ber hilweşîna pergala xizmetguzariya dewletê û têkçûna sektorên tenduristî, perwerde û xwarinê, hewcedarî alîkariya mirovî a lezgîn in.
Bajarên ku berê navendên jiyana aborî û civakî bûn, niha veghurîne deverên vala, di heman demê de rê tijî karwanên koçberan bûne ku li ewlehiyê digerin, herwiha dîmenên malbatên ku li kampên koçberan li erdê radizin, an jî yên ku sînoran ber bi welatên cîran ve derbas dikin, bûne wêneyek rojane ya krîzê. Ji ber çavkaniyên sînorkirî li wan welatan, zexta mirovî dest pê kir ku ji sînorên Sûdanê derbas bibe da ku veguhere krîzeke herêmî ku gefê li aramiya li Qerin Efrîqiya û peravê dixwe.

**Xeteriyeke bê denge**

Krîza xwarinê yek ji encamên herî giran ên şer e; têkbirina çalakiyên çandiniyê û qutbûna rêzên dabînkirinê bûye sedema bilindbûneke bêhempa ya buhayên xwarinê, di heman demê de bi hezaran malbat li hin deveran çavkaniyên dahata xwe winda kirine û peydakirina xwarineke rojane bûye pirsgirêkek rastîn, nemaze ji bo zarok û kesên bi temen mezin. Rewş her ku diçe xirabtir dibe, rêxistinên navneteweyî hişyariyê didin li ser zêdebûn û berfirehbûna krîza xwarinê ku ew sînaryoyeke dê ezmûnên mirovî yên bi êş ên li herêmê di dehsalên berê de tîne bîra mirov. Di heman demê de kêmbûna xwarinê tê wateya belavbûna nexweşî, kêmbûna xurekê nemaze di nav komên herî kêm hêz de.

**Sektora tenduristiyê**

Sektora tenduristiyê li Sûdanê ji ber rewşa şer bi giranî bandor lê bûye; nexweşxane li deverên berfireh ji xizmetê derketine, di heman demê de karmendên bijîşkî li hin deveran ji kêmbûna giran a alav û dermanan êşê dikişînin herwiha nexweş xwe dispêrin înîsiyatîfên xwebexş ên sînorkirî ku nikarin bi asta karîsetê re gavan bavêjin.
Ji ber nebûna ava paqij û rewşa tenduristiyê ya xirab li kampên koçberan, nexweşî belav bûne ku êşa mirovî girantir dike. Ji ber nebûna lênêrîna tenduristiyê ya bingehîn, zarok û jinên ducanî herî zêde ji van rewşan bandor dibin.

**Sektora perwerdeyê**

Yek ji windahiyên herî bi êş di vê krîza mirovî de, têkbirina pêvajoya perwerdeyê ji bo bi milyonan zarokên Sûdanî ye; dibistan ji bo kesên bêwar bûne stargeh, an jî di encama operasyonên leşkerî de wêran bûne, dê ev yek nifşekî bi windakirina mafê wan ê perwerdeyê tehdît dike.
Ev astengî ne tenê krîzeke perwerdeyê pêk tîne, lê di heman demê de bandorên demdirêj ên civakî û ewlehiyê jî bi xwe re tîne, ji ber ku ew derî li ber belavbûna karkirina zarokan, leşkerkirina bi darê zorê û jirêderketina civakî vedike.

**Koçberî û penaberbûn**

Sûdan yek ji mezintirîn pêlên koçberiya navxweyî di dîroka xwe de dijî, bi milyonan welatî neçar mane ku ji bo ewlehiyê malên xwe biterikînin û bi sed hezaran kesan jî sînoran derbas kirin da ku ber bi welatên wekî Tişad, Sûdana Başûr, Misir û Esyopiya ve biçin, ku ji bo wan welatan jî ku ji berê ve ji krîzên aborî û ewlehiyê dikişînin, pirsgirêkên mirovî yên nû diafirîne.
Kampên penaberan ji kêmasiyên giran ên xwarin, av û xizmetên tenduristiyê dikişînin, di heman demê de metirsiya belavbûna nexweşiyan û belavbûna sûcan ji ber şert û mercên jiyanê yên dijwar zêde dibe.

**Berteka civaka navneteweyî li gorî rewşa heyî kêm e**

Tevî hewldanên rêxistinên navneteweyî û herêmî, mîqdara alîkariyê hîn jî ji pêdiviyên rastîn pir kêmtir e. Aloziya rewşa ewlehiyê û zehmetiya gihaştina herêmên pevçûnê rê li ber gihandina alîkariya mirovî digire, ev yek dibe sedema ku bi milyonan sivîl rasterast bi encamên şer re rû bi rû dimînin.
Herwiha, pêşbaziya jeopolîtîk a li ser Sûdanê siyekê diavêje ser rêya çareseriyên mirovî û siyasî, ji ber ku berjewendiyên herêmî û navneteweyî bi hewildanên ji bo bidawîanîna krîzê ve girêdayî ne.

**Gefên li ser paşeroja Sûdanê**

Krîza mirovî ya heyî ne tenê bi êşên tavilê ve sînordar e, lê bandorên wê yên kûr li ser pêşeroja Sûdanê jî hene; koçberiya girseyî dibe sedema hilweşîna tevna civakî, di heman demê de hilweşandina binesaziyê gefê li dirêjkirina başbûnê piştî bidawîbûna şer dixwe.
Di heman demê de zêdebûna rêjeyên xizaniyê û bêkariyê dikare bibe sedema pêlên nû yên koçberiya neqanûnî û ji bo tundrewî û sûcên rêxistinkirî hawîrdorek berhemdar biafirîne, ev jî krîza Sûdanê dike pirsgirêkek herêmî û navneteweyî ku ji sînorên neteweyî derbas dibe.

**Rêya derketina ji kirîzê û êşê**

Ji bo bidawîkirina krîza mirovî li Sûdanê, berî her tiştî agirbestek berfireh û domdar hewce dike ku rê li ber gihaştina bê asteng a alîkariyên mirovî veke. Herwiha pêdiviya Sûdanê bi planeke navneteweyî ya yekgirtî ji bo ji nû ve avakirin û piştgiriya aborî, digel bernameyên lihevhatina neteweyî ku baweriyê di navbera pêkhateyên civakê de ji nû ve ava bikin heye.
Krîza mirovî li Sûdanê ezmûneke rastîn a pabendbûna civaka navneteweyî bi nirxên hevgirtina mirovan re temsîl dike; êşa bi milyonan kesan divê di raporên rêxistinên navneteweyî de tenê bi hejmaran neyê kêmkirin, lê divê wekî pirsgirêkek mirovî were destgirtin ku çalakiyek lezgîn û berfireh hewce dike.
Her roja ku bêyî bersiveke navneteweyî ya bi bandor derbas dibe, kirîza mirovî girantir dike, malbatan dixe nava metrsiyên birçîbûnê. Dema ku nan dibe xewnek, av dibe xeterî û ewlehî jî xewnek dûr, axaftina li ser çareseriyên demdirêj bêwate dibe. Tiştê ku niha hewce ye, kiryarên lezgîn û berpirsiyar in da ku hilweşîn were rawestandin û bi milyonan Sûdanî şansek ji bo jiyanê bidin.
Sûdan îro li ber hilweşînê ye. Lê eger îradeyek hebe, rizgarkirin hîn jî mimkun e, ji ber ku kirîz ne qedereke, lê tiştê ku li Sûdanê tê jiyîn tenê encama hilbijartinên mirovan e ku dikarin werin guhertin. Di cîhanek ku bi karîsetan re rû bi rû ye, ezmûna Sûdanê dê bibe ceribandinek ji bo şiyana civaka navneteweyî ku çawa karibe parastina rûmeta mirovan bike, dema ku jiyana rojane bi xwe dibe têkoşîna ji bo jiyanê.

# Zanîngeha Oxfordê pirtûka zimanzaniyê ya Kurdî çap kir

**Navenda Nûçeyan**

**Weşanên Zanîngeha Oxfordê pirtûka zaravayên Kurdî ya Ingilîzî bi navê “The Oxford Handbook of Kurdish Linguistics”, (Pirtûka Dest a Zimanzaniyê ya Kurdî) amadekiriye û hatiye çap kirin.**

Pirtûka bi ser zimanê Kurdî ya bi navê “The Oxford Handbook of Kurdish Linguistics”, (Pirtûka Dest a Zimanzaniyê ya Kurdî) ya ji hêla Oxfordê hatiye amade kirin ku yek ji pirtûkên herî berfireh a akademîk tê nirxandin, hatiye çapkirin û weşandin.

**Derbarê zimanê Kurdî analîzên berfireh û nûjenkirî hene**

Li gorî ajansa Azadiya Welat, Pirtûka Dest a Zimanzaniyê ya Kurdî bi edîtoriya Jaffer Sheyholislami, Geoffrey Haig, Haidar Khezri, Salih Akin ve Ergîn Opengîn hate amadekirin. Pirtûk bi giştî ji 656 rûpelan pêk tê. Herwiha di pirtûkê de derbarê her şeş zaravayên bingehîn ên Kurdî bi awayeke berfireh û nûjenkirî analîz hene. Xebata ku şêwazên morfosentaksê yên nûjen di nava xwe dihewîne û di vê hêlê de wek çavkaniyek berfireh tê hesibandin.
Di pirtûkê de bingeha rêzimana Kurdî, çawaniya rêzimanê, cudahiyên di navbera zaravayan û pêşketina ziman a dîrokî tê destgirtin. Herwiha di serî de ji Bakur, Başur, Rojhilat û Rojava lêkolînên gelek kesên li cihê ku Kurdî lê tê axaftin û gelek navendên akademîk ên cîhanê keda lêkolîneran di pirtûkê de heye.

**Derbarê nexşeyên ziman de şîroveyên nû**

Di çavkaniya hatiye weşandin de ji mijarên herî balkêş yek jî şîroveyên nû yên li ser nexşeya ziman e. Xebat û ziman ne tenê girêdayî erdnîgariyê di heman demê de çawaniya avabûna wê ya dîrokî ve jî vedibêje. Herwiha di pirtûkê de gotûbêjên zimanzanên li Kanada, Almanya, Swêd, Ingîlîstan, û DYAyê yên ser Kurdî hîndekariyê dikin jî hene.

**Hêsaniya xwegihandinê**

Pirtûk dê li ser platformên dijîtal bêpere werin daxistin. Pirtûk wek kaxiz jî hate çapkirin û dê çapkirî jî bi 208 dolaran tê firotin.



# Pêvajoya Rojava: Berxwedan neşikest, qonaxek nû dest pê kir

**Hasan Ağaç**

Êrîşên ku di Çileya 2026'an de li dijî Rojava hatin destpêkirin ne tenê manevrayek leşkerî bûn. Ev êrîş nîşanek li ser erdê ya hevsengiya hêzê ya ji nû ve hatî saz kirin li Rojhilata Navîn in. Tiştê ku îro li Sûriyeyê diqewime êdî ne pevçûnek di navbera hêzên herêmî de ye; ew veguheriye pêvajoyek ji nû ve sêwirandinê ku aktorên navneteweyî û herêmî rasterast tê de beşdar in.

Rewşa ku bi hilweşîna rejîma Baasê derket holê demek dirêj bi "dînamîkên navxweyî" dihat ravekirin. Lêbelê, niha bi zelalî tê dîtin ku hêza sereke ya ku rêça pêşketinên li ser erdê diyar dike destwerdana derve ye. Bandora Îran û Hizbullahê sînordar bûye, rola Rûsyayê kêm bûye, û valahiya ku derketiye holê bi rewakirina avahiyên ku berê bi El-Nusra re di bin navê "rêveberiya nû" de bûn, hatiye dagirtin.

Ev rewş bi awayekî zelal nîşan dide ku avahiya nû ya li Şamê li ser îradeyek siyasî ya serbixwe nehatiye avakirin.

Di vê çarçoveyê de, êrîşên li ser Rojava ne tesadufî ne. Ev êrîş beşek ji planeke mezintir in. Yek ji armancên sereke yên vê planê qelskirina modela Rêveberiya Xweser û heke gengaz be jî ji holê rakirina wê ye. Afirandina pevçûnek di navbera nifûsa Kurd û Ereb de jî aliyek girîng ê vê planê ye. Ji ber ku hêza herî mezin a Rojava di şiyana wê ya avakirina modelek li ser bingeha jiyana hevbeş a gelên cûda de ye.

Êrîşên ku li dora Bendava Tişrîn û Helebê di seranserê sala 2025'an de hatine kirin, aliyê leşkerî yê vê planê pêk anîn. Lêbelê, berxwedana li ser erdê rê li pêşiya vê planê girt ku bi lez bigihîje armancên xwe. Her çend li hin deveran hin paşvekişandin çêbûn jî, wêneya encam ne hilweşînek, lê veguheztinek ber bi xeta parastinê ya dijwartir û kontrolkirî nîşan dide. Dema ku çalakiyên leşkerî bi ser neketin, pêvajoyek nû di bin navê "diyalogê" de hate destpêkirin. Civînên ku di 10'ê Adarê û 1'ê Nîsanê de hatin lidarxistin divê di vê çarçoveyê de werin nirxandin. Tevî pêşniyarên ku ji hêla Rêveberiya Xweser û QSD ve li ser bingeha çareseriyek demokratîk hatine pêşkêş kirin, eşkere ye ku rejîma Şamê ev pêvajo ne wekî bingehek rastîn ji bo çareseriyê, lê wekî rêyek ji bo qezenckirina demê û rewakirina xwe bi kar anî. Berevajî vê, amadekarî, rêxistin û îradeya berxwedanê ya ku li Kobanê û Hesekê derket holê, rê li ber pêkanîna tevahî ya vê planê girt. Biryardariya li van deveran rê li ber pêşveçûna êrîşê girt û hevsengiya li ser erdê ji nû ve diyar kir.

Rastiya bingehîn neguherî ye: Berxwedan nehatiye şikandin. Qurbaniyên ku di vê pêvajoyê de hatine dayîn careke din nîşan dane ku ew ne tenê hêza leşkerî, lê di heman demê de hêza îdeolojîk û exlaqî jî hildigire. Ev karakterê tevgera Apoîst e.

Îro, sê hêmanên bingehîn hene ku rêça pêvajoyê diyar dikin: Ya yekem, berxwedana li ser erdê. Ya duyemîn, piştgiriya civakî ya ku li her çar beşên Kurdistanê û navneteweyî derketiye holê. Ya sêyemîn, û ya herî diyarker, destwerdana Rêber Apo di pêvajoyê de ye.

Têkoşîna ku li Îmraliyê tê meşandin, digel parastina zemîna çareserî û diyalogê, xetek siyasî ya zelal li dijî êrîşên li ser erdê jî ava kiriye. Vê destwerdanê rasterast bandor li rêça pêvajoyê kiriye û yek ji faktorên sereke bûye ku rê li ber zêdebûna êrîşan girtiye. Dema ku rewşa encam tê nirxandin, nêzîkatiyên zêde optimîst an bi tevahî pesîmîst rastiyê nîşan nadin. Rojava di nav salan de jiyanek xweser a de facto ava kiriye. Di vê nuqteyê de, îhtîmala ku ev avahî çarçoveyek qanûnî bi dest bixe derketiye holê. Ev ne tenê ji bo Kurdan, lê ji bo hemî gelên ku li Sûriyeyê dijîn pêşketinek girîng e. Lêbelê, gef hîn jî ji holê ranebûne. Hevsengiyên herêmî hîn jî nazik in, û provokasyonên nû her gav mimkun in. Ji ber vê yekê, amadekariya ji bo pêşketinên gengaz bi qasî rêvebirina rast a pêvajoyê girîng e. Êrîş û vekişînên dawî li hin deveran nayê wê wateyê ku paradîgmaya Apoîst qels bûye. Berevajî vê, vê pêvajoyê bi awayekî zelaltir nîşan da ku ev xet çiqas bertekek civakî bi hêz dîtiye.

Pîrozbahiyên Cejna Newrozê, ku îro bi beşdariya bi mîlyonan pêk hatin, nîşana herî zelal a vê rastiyê ne. Îradeya ku li van deveran derket holê ne tenê pîrozbahiyek e; ew îlanek e ku fikra civaka demokratîk civakî bûye.

Tiştê ku îro diqewime ne dawî ye. Ew qonaxek nû û biryardartir e. Di vê qonaxê de, tiştê ku diyarker e ne tenê hêza leşkerî ye; ew rêxistin, hişmendî û îradeya gel e. Ji ber ku ev têkoşîn êdî ne tenê têkoşînek li yek deverê ye, lê têkoşînek dîrokî ye ku pêşeroja gelê Kurd diyar dike.

## Newroz: Roja Nû ya Gelan



Gulîstan Xalid

Newroz ne tenê destpêkek salnameyê an guhertinek demsalî ye; ew di seranserê dîrokê de bûye sembola berxwedan, hêvî û ji nû ve zayîna gelan. Newroz ku tê wateya "rojek nû", nemaze ji bo gelên li Rojhilata Navîn dijîn, hilgirê hafîzeya çandî û siyasî ye. Di vî warî de, Newroz ne tenê pirek e ku ji rabirdûyê ber bi niha ve dirêj dibe, lê di heman demê de îfadeya hêviyek hevpar ji bo pêşerojê ye. Koka Newrozê vedigere hezaran salan. Li gorî efsaneyan, serkeftina Kawayê Hesinkar, ku li hember Dehaqê zalim li ber xwe da, wekî destpêka sembolîk a Newrozê tê hesibandin. Ev riwayet ne tenê efsane ye, lê di heman demê de sembola berxwedana gelan li dijî zilmê û lêgerîna wan a azadiyê ye. Ji ber vê yekê, Newroz ji bo gelek civakan, nemaze ji bo gelê Kurd, cejna azadî û nasnameyê ye. Di heman demê de, Newroz şiyarbûna xwezayê, hatina biharê û vejandina jiyanê temsîl dike. Her ku erd şîn dibe, hêviyên mirovan jî zindî dibin. Di vî warî de, Newroz ne tenê vegotina rabirdûyê ye, rastiyek zindî ye ku her sal ji nû ve tê jiyîn.

Newroz ji hêla Kurd, Tirk, Faris, Ereb û gelên Asyaya Navîn ve bi awayên cûda tê pîrozkirin. Ev pirrengî nîşan dide ku Newroz nirxek gerdûnî hildigire. Her gelek bi fîgûrên xwe yên çandî ku lê zêde dike jî, di hestek hevpar de dibine yek: nûbûn, hêvî û xwesteka jiyana bi hev re. Îro, di civakên pir-nasname û pirçandî de, hêza yekgirtî ya Newrozê hîn girîngtir bûye. Cejna newrozê, ku ji aliyê civakên cihêreng ve tê pîrozkirin, cihekî hevdîtinê ye ku ji sînorên çandî derbas dibe. Ev yek wê ne tenê dike cejn, di heman demê de dike platformek ji bo diyalog û hevgirtinê jî.

Di roja îro de, wateya Newrozê wekî "roja nû" wekî sembola entegrasyona demokratîk, wekhevî û jiyana hevbeş di navbera gelan de ji nû ve tê şîrovekirin. Entegrasyona demokratîk tê wateya ku nasname, ziman û çandên cûda bêyî ku werin tepisandin dikarin bi hev re wekhev û azad bijîn. Di vê çarçoveyê de, Newroz sembola têgihîştineke civakî ya nû ye ku tê de gel hevdu nas dikin û cûdahî ne wekî gef wekî dewlemendî têne dîtin,. "Roja nû" li vir serdemekê nîşan dide ku tê de zîhniyet diguhere, diyalog li şûna pevçûnê, naskirin li şûna înkarê û wekhevî li şûna cudakariyê ye. Di vê wateyê de, agirê Newrozê ne tenê kevneşopiyek e, di heman demê de ronahiya ku ji bo aştî û pêşerojeke hevpar di navbera gelan de tê vêxistin e.

Newroz semboleke bihêz e ku kevneşopiyeke berxwedan û hêviyê ya ji rabirdûyê mîrasgirtî bi nirxên demokratîk ên îro re dike yek. Wek roja nû ya gelan, Newroz ne tenê cejnek e; ew di heman demê de baweriyeke kolektîf e ku jiyana hevbeş, aştî û azadî pêşkêş dike. Pîrozkirina Newrozê îro ne tenê pêxistina agir an jî govend girtine. Ew di heman demê de nîşandana îradeya ku gel dikarin di pêşerojeke wekhev, azad û demokratîk de bi hev re bijîn e. Ji ber vê yekê, Newroz hêviyek e ku her sal ji nû ve tê zindî kirin û deriyek ku bo pêşeroja hevpar a gelan vedibe.

# Anatomiya Newroza 2026an

**Botan Amed**

Pîrozbahiyên Newroza 2026an ne tenê destpêka çerxek salnameyê bû, lê di heman demê de kêliyek civakî jî temsîl dikir ku dîrok û roja îro bi hev re ketine û bîra kolektîf ji nû ve hatiye avakirin. Efsaneya Kawayê Hesinkar, yek ji vegotinên herî kevin ên Mezopotamyayê, îsal careke din bi agirên ku li meydanan hatin pêxistin hate bîranîn. Li gorî efsaneyê, agirê ku ji hêla hesinkarekî ku li dijî zilmê serî hildabû ve hate pêxistin ne tenê serketinê, lê di heman demê de îradeya gelan a diyarkirina çarenûsa xwe jî sembolîze kir. Ev vegotina dîrokî di nav sedsalan de bi awayên cûda hatiye hilberandin û heta roja îro hatiye gihandin, bûye yek ji referansên bingehîn ên ku ruhê Newrozê diyar dike. Pîrozbahiyên Newroza 2026'an li Amed yek ji dîmenên herî berbiçav ên vê berdewamiya dîrokî bûn. Bi sed hezaran, ku ji saetên serê sibê ve ber bi meydanan ve herikîn, ne tenê ji bo pîrozkirina cejnekê, lê di heman demê de ji bo hilgirtina mîrateyek ji rabirdûyê ber bi roja îro ve hatin cem hev. Di vê atmosferê de ku reng, muzîk û peyv bi hev re dikevin, wateya Newrozê ji rêûresmek çandî ya sade derbas dibe, vediguhere îfadeyek zindî ya vegotinek dîrokî. Kesayetên nûjen jî di vê vegotina dîrokî de girîngiyek girîng digirin. Bi taybetî, Mazlum Doğan û Zekiye Alkan kesayetên Kawa yên hemdem ên Cejna Newrozê temsîl dikin û sembola wê dikin. Ev kesayet, ku di atmosfera siyasî ya salên 1980'an de derketine holê, ji hêla gelek koman ve bi mijarên berxwedan û qurbaniyê ve hatine girêdan, mîna vegotina Kawa. Ji ber vê yekê, behsa van navan di pîrozbahiyên Cejna Newrozê de ne tenê wekî bîranînên takekesî, lê di heman demê de wekî hewldanek ji bo avakirina girêdanên nûjen di berdewamiya dîrokî de jî dikare were dîtin. Ev girêdana dîrokî di pîrozbahiyên 2026an de bi tundî hate dîtin. Sembolên ku li meydanan dihatin hilgirtin, dirûşmeyên ku dihatin qîrîn û axaftinên ku dihatin kirin wekî pirek di navbera paşeroj û niha de xizmet dikirin. Girêdana ku nifşên ciwan, bi taybetî, bi van kesayetên dîrokî re çêkirin, hilberandin û veguhestina bîra kolektîf ji nifşekî bo nifşekî din nîşan da. Ev rewş eşkere dike ku Cejna Newrozê ne tenê bîranîna paşerojê ye, lê di heman demê de avakirina wateyê ji bo pêşerojê ye. Aliyek din a girîng a pîrozbahiyan peyama Rêber APO bû, ku di qada giştî de hate nîşandan. Mijarên berbiçav di vê peyamê de diyalog, yekîtiya civakî û balkişandina li ser pêşkeftinên herêmî bûn. Parvekirina peyamên weha di çalakiyên girseyî yên wekî Cejna Newrozê de careke din nîşan da ku cejn ne tenê qadeke çandî ye, lê di heman demê de platformek ji bo derbirîna ramanên siyasî ye jî. Di dîrokê de, Cejna Newrozê di her serdemê de bi wateyên cûda ji nû ve hatiye şîrovekirin. Bi şiyarbûna xwezayê di demên kevnar de ve girêdayî, ev cejn bi demê re wateyên civakî û siyasî bi dest xistiye. Cejna Newrozê ya 2026'an wekî mînakek hemdem a vê avahiya pir-qatî derket holê. Ji aliyekî ve, vegotina mîtolojîk a Kawayê Hesinkar, û ji aliyê din ve, fîgurên sembolîk ên serdema nûjen; hemî di heman demê de, di heman cihî de, di heman rêûresmê de, wateyek nû bi dest xistin. Di encamê de, Cejna Newrozê ya 2026'an wekî ezmûnek civakî li xaçerêya dîrok û niha derket pêş. Bi vegotinên rabirdûyê ve hatî xwedîkirin, bi dînamîkên niha ve hatî şekilkirin, û hêviyên ji bo pêşerojê vedihewîne, ev pîrozbahî bi zelalî nîşan didin ka çima Cejna Newrozê sembolek bihêz dimîne. Di vî warî de, Cejna Newrozê ne tenê cejnek e; ew wekî bîranînek, vegotinek û şêweyek hebûna civakî berdewam dike.



# Êrişên Israîl-DYA li dijî Îranê, herêmê ber bi kirîzeke dijwar ve dibe

**Şerê Îran û DYA-Israîl ku beriya 25 rojan dest pê kiribû bi hemû hêza xwe dewam dike û li ser Rojhilata Navîn û tevahî cîhanê bandoreke neyênî dike.**




**Navenda Nûçeyan**

Şerê di navbera Îran û Îsraîl-Amerîkayê de 25rojin dewam dike, Rêxistina Mafê Mirovan (HRANA) derbarê rewşa şer ya di 24 saetên dawî de agahî parvekir.

Li gorî rêxistinê di nava 24 saetên dawî de, li 15 parêzgehên Rojhilatê Kurdistan û Îranê nêzî 206 êriş pêkhatine.

Hate gotin di êrişan de baregehên leşkerî, baregehên Supayê Pasdaran, navendên Besîc, balafirxaneyên leşkerî, baregehên polîsan, bîrên petrole û çavkaniyên bin erd yên atomî hatine hedef girtin.

Hate gotin di nava 24 saetên borî de, di encama êrişan de welatiyek jiyana xwe ji dest daye, yek jê jin, 3 jî birîndar bûne.

Li gorî heman çavkaniyê, piraniya êrişan li ser Tahran, Elburz, Esfehan, Bender Ebas, Qum, Buşehir, Mihemed Şehir, Şehir Tewrêz, Xuzistan û Xurem Abad pêkhatine. Hêjayî gotinê ye li gorî daneyên ne fermî, ji roja şer destpêkirî heya duh, hezar û 407 welatî mirine. Jivê hejmarê tê gotin 214 zarokin. Herwiha hezar û 167 endamên hêzên ewlekarî û leşkerî jî hatine kuştin.

### Rêjîma Îranê li Rojhilatê Kurdistanê hêza xwe zêde dike

Li gorî agahiyên herêmê û medyaya Rojhilatê Kurdistanê, rejîma Îran hêzên xwe yên li herêmên Rojhilatê Kurdistanê zêdetir dike. Tê gotin di nava 3 rojên borî de, rejîma Îranê hêzek zêdetir li bajarê Merîwan, ser sînorê Rojhilat û Başûrê Kudistanê, herwiha li çiyayên Surenê ku dikeve beramberî navçeya Seyîdsadiq ya Başûrê Kurdistanê, bicih kiriye. Li gorî çavkaniyan, rejîm bi bicihkirina hêzên xwe ya li çiyayan, dixwaze xwe ji êrişên hewayî biparêze.

Zext û binçavkirinên rejîma Îranê yên li ser Kurdan berdewame. Hat ragihandin ku di sê rojên borî de 5 welatiyên Kurd ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine binçavkirin.

Rêxistina Mafên Mirov ya Rojhilatê Kurdistanê di derbarê zext û binçavkirinên rejîma Îranê yen li dijî Kurdan de nûçeyek belav kir. Di nûçeyê de hatiye diyarkirin ku di nava 3 rojên borî de 5 welatiyên Kurd yên xelkê Mehabad, Tehran û Loristanê ne, bêy fermana dadwer bi êşkenceyê ji aliyê hêzên Îtlaeta Îranê ve hatine binçavkirin û çarenûsa wan nayê zanîn.

### Serokê Amêrkayê careke din gef li rêjîma Îranê xwar

Serokê Amerîkayê gef li Îranê xwar û got; ''Tengava Hurmuzê di nava 48 saetan de neyê vekirin em ê êriş bikin.''

Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) Donald Trump gef xwar ku eger Tengava Hurmuzê neyê vekirin wê êrişê bibin ser binesaziya enerjiyê ya Îranê.

Donald Trump ragihand ku eger Tengava Hurmuzê di nava 48 saetan de jinûve neyê vekirin wê êrişên nû bibin ser Îranê. Trump li ser hesabê xwe yê Truth Social daxuyaniyek da û got, "Eger Îran ji vê kêliyê heta bi 48 saetan Tengava Hurmuzê bi temamî venek, DYE wê ji ya herî mezin destpê bike û êrişê bibe ser santralên enerjiyê û tine bike."

### Tengava Hirmiz

Li gorî nûçeya Daily Mail, keştiyeke nukleerî ya binê avê ya Îngiliz ku fuzeyên Tomahawk tê de ne, li Derya Ereb bi cih bûye.

Li qada navneteweyî Îngilistan, Elmanya, Fransa, Japonya û Koreya Başûr jî di nav de zêdeyî 20 welatan hewldana Îranê ya girtina Tengava Hurmuzê şermezar kirin û gotin, wê piştgiriyê bidin hewldanên navneteweyî yên ji bo pêkanîna derbasbûna bi ewle ya ji tengavê.

Hatiye diyarkirin ku navên her pênc kesan, Awat Sorgulî, Îsmaîl Şukrî, Kiyanûs Emînî, Howyar Zehabî û Celal Elewî ne.



### CENTCOM: Me 8 hezar hedefên leşkerî li Îranê têk birin

Fermandarê CENTCOM'ê Brad Cropper diyar kir ku tevî 130 keştiyên Îranê wan li zêdetirî 8 hezar hedefên leşkerî xistine.

Fermandarê Fermandariya Navendî ya Amerîkayê (CENTCOM) Amîral Brad Cropper ragihand ku di operasyonên li dijî Îranê de 130 keştî di nav de zêdetî 8 hezar hedefên leşkerî hatin xistin. Cropper di vîdyoya nûjenkirina operasyonî ya hatî weşandin de derbarê êrişên DYA'yê yên li ser Îranê daxuyanî da.

Cooper diyar kir ku artêşa DYA'yê heta îro 130 keştî di nav de zêdetî 8 hezar hedefên leşkerî dane û ev tişt got: "Hêzên wan ên deryayî dernakevin deryayê. Balafirên wan ên şer ên taktîkî nafirin û şiyana wan a avêtina moşekan û balafirên bêmirov, ya ku di destpêka şer de di asteke bilind de bû, ji dest dan."

### Ji ber êrişan ziyanên mezin rû dan

Serokê Heyva Sor ya Îranê Pîr Huseyîn Kolîvend ragihand ku di êrişan de ziyan gihiştiye zêdetirî 70 hezar avahiyan.

Serokê Heyva Sor ya Îranê Oîr Huseyîn Kolîvend ragihand ku di êrişên Îsraîl-Amerîkayê de 251 navendên tenduristî û 498 dibistan jî di nav de ziyan gihiştiye zêdetirî 70 hezar avahiyên sivîlan.

Kolîvend eşkere kir ku di êrişên Îsraîl-Amerîkayê de zêdetirî 18 hezar sivîl birîndar bûne.

### Rêjîma Îranê pêleke binçavkirina welatiyan da destpêkirin

Rejîma Îranê pêlek din a girtin û binçavkirina welatiyan daye destpêkirin. Rêxistina Mafê Mirovan a Îranê ragihand ku 220 kes li seranserê welat hatine binçavkirin.

Wezareta Îtlaatê ya Îranê binçavkirina hejmareke mezin ji welatiyan li welat qebûl kir. Di heman demê de Rêxistina Mafên Mirovan a Îranê bîlançoya binçavkirina welatiyan li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê eşkere kir.

Rêxistina Mafên Mirovan a Îranê ragihand ku li 26 parêzgehên Rojhilatê Kurdistanû îranê 111 welatî bi hinceta 'dijmin û neyarên welat' hatin binçavkirin.

Ev di demekê de ye ku beriya niha jî Pasdarên Şoreşa Îranê ragihandibû ku kesên binçavkirî dê wekî 'sîxur' nêzîkatî lê werin kirin, lê ti belge nehatibûn weşandin ku nîşan bidin ew sîxurin.

Rêxistina Mafên Mirovan a Îranê da zanîn ku di pêlek nû ya gef û binçavkirina welatiyan de, li parêzgehên Tehran, Elbûrz, Hemedan û Urmiyeyê herî kêm 220 welatî hatine binçavkirin.

Her wiha Rêxistinê destnîşan kir ku ev binçavkirin bi sûcê 'şandina wêne û dîmenan ji medyayên biyanî re û hewldanên ji bo lidarxistina xwepêşandanan' hatine pêkanîn.

### Rewşa girtîgehên Îranê

Rêxistina Mafên Mirov ya Îranê eşkere kir girtiyên siyasî yên li girtîgeha Evîn de dimînin ji xizmetguzariyên sereke yên jiyanî û tendirustiyê bêpar tên hiştin û metirsî li ser jiyana girtiyan zêde dibe.

Rêxistina Mafên Mirov ya Îranê di derbarê rewşa girtiyên siyasî yên jin ên li girtîgeha Evîn de agahiyên nû parve kir.

Li gor rapora rexistinê, girtiyên jin yên siyasî li girtîgeha Evîn ji mafên xwe yên sereke yên jiyan û xizmetguzariyên tendirustiyê bêpar hatine hiştin. Hatiye diyarkirin ku gelek jinên girtî nexweşiyên wan yên cûda hene û pêwîstiya wan bi çavdêriya bijîşkî hene.

Di raporê de hatiye diyarkirin ku ji ber nebûna xizmetguzariyên tendirustî û xwarina ne paqij, ji bilî girtiyên nexweş, rewşa girtiyên bi tendirust jî xirab bûne û metirsiyek mezin li ser tendirustiya girtiyan heye.

Di rapoê de hatiye diyarkirin ku li hin beşên girtîgehê de cihên razanê nîne, girtî neçar dimînin li ser erdê radizin. Her wiha xerciya xwarin, tendirustî û çavdêriya bijîşkî dixin li ser girtî û ev yek jî barê wan girantir dike.

### Welatên Rojhilata Navîn Êrişên Îranê şermezar kirin

Bi tevlîbûna wezîrên derve yên 12 welatên Erebî û Îslamî yên Rojhilata Navîn, li paytexta Erebîstana Siudî civînek hat lidarxistin û têde êrişên Îranê yên li ser welatên herêmê hatin şermezarkirin. Tirkiye û Pakistan jî tevlî civînê bûn.

Li gor daxuyaniyek hevbeş a 12 welatên Erebî û Îslamî yên Rojhilata Navîn, duh li Riyada paytexta Erebistana Siudî bi tevlîbûna wezîrên derve yên; Azerbaycan, Behreyn, Misir, Urdun, Kuweyt, Lubnan, Pakistan, Qeter, Erebistana Siudî, Suriye, Tirkiye û Îmaratê civînek hat lidarxistin.

Di daxuyaniyê de hatiye diyarkirin ku beşdarvanên civînê êrişên Îranê yên li ser baregeh û navendên dîplomasî, jêrxana aborî, deverên niştecihbûnê ya welatên herêmê wek êrişên dijminane binav kirine û gotine ku ti hincetek ji van êrişan re nîne. Her wiha hatiye diyarkirin ku beşdarvanên civînê dane zanîn ku mafê dewletên herêmê heye ku li gor madeya 51 a lihevkirina Neteweyên Yekbûyî parastinê li welatê xwe bikin.

Her wiha hatiye gotin ku beşdarvanên civînê daxwaz ji Îranê kirine ku demildest êriş û dijminkariya xwe bisekinîne û rêzê li yasayên navdewletî bigre û ji bo çareseriya qeyranan serî li dîplomasiyê bigre.

# Nameyên pîrozbahiya Newroza 2026’an: Banga xurtkirina yekîtî û aştiyê

Pîrozbahiyên Newrozê li çar aliyên Kurdistanê û gelek deverên cîhanê bi beşdarbûna bi hezaran hat pîrozkirin û hîn jî tê pîrozkirin. Newroza îsal çoşa xwe ji salên çû, hîn zêdetir û mezintir hat pêşwazîkirin û tê de gelek nameyên girîng ên ku banga yekîtî, aştî, demokrasî û hevgirtinê dikin, hatin xwendin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Newroz li Kurdistanê ji bo Kurdan ne tenê wekî serê salê yan hatina biharê ye, lê wekî sembola man û nemanê, nasname û berxwedanê tê dîtin. Ev cejn di qadên siyasî, civakî, çandî û aborî de xwedî bandoreke kûr e. Di pîrozbahiyên Newrozê de daxwazên mîna naskirina nasnameya Kurdî, zimanê dayikê û statûya siyasî derdikevin pêş. Newroz gelek caran dibe qada deklarasyonên girîng ji bo çareseriya pirsgrêka Kurd û bangên ji bo aştiyeke mayînde. Newroza 2026’an jî bi çoşekî gelekî girseyî piştî pêvajoyên giran hatin geşkirin û pîrozkirin, li her derê bi hezaran Kurd herkîn qada û qada Newrozê bi rengê Kurdisatanî xemilandin. Di heman demê de di Newrozê de gelek name û pîrozbahiyên cuda cuda ji aliyê gelek navdar, siyasetmedar, partî û kesayetên Kurd ên giştî û jin li ser asta Kurdistanî hatin dayîn. Di hemû nameyan de ya ku balkişandin li ser hatibû kirin, avakirin û xurtkirina yekîtiya gelê Kurd li Kurdistanê û cîhanê bû. Hin ji naveroka nameyên girîng jî ev in:









### Nameya Rêber Apo

Niha, rûpelên veşartî yên dîrokê derdikevin holê, îhtîmala aştiyê di navbera gelan û avakirina neteweya demokratîk de zêde dibe. Her ku kevneşopiyên dewletê yên Sunî û Şîe û kevneşopiyên neteweperestî tên derbaskirin, derfeta jiyana azad a di navbera gelan de xurt dibe. Îro rûpeleke nû vebûye. Rê ji bo gelên vê herêmê hatiye vekirin ku bi hev re bi awayekî azad bijîn. Pêvajoya ku me di 27’ê Sibata 2025’an de da destpêkirin, armanc dike ku bingehên yekîtiyekê li gorî ruhê Newrozê vejîne. Ji bo vê yekê, divê em bawer bikin ku çand û bawerî dikarin bi hev re bijîn, em dikarin ji îdeolojiyên teng ên neteweperest derbas bibin û li ser bingeha entegrasyona demokratîk bibin yek û bi hev re hebûna xwe ava bikin. Divê em wê hişmendiyê derxin holê ku em dikarin wekî di dîroka me de çêbûye îro jî li hember her cûre şer, xizanî û hovîtiyê bi ser bikevin.

Newroza 2026’an bi hemû geşbûna xwe nûjenkirina vê dîrokê ye. Dîrok niha derdikeve holê, digihe firsendeke mezin ji bo hişmendiya li ser bingeha nasnameya çandî ya rastîn. Wate û hêza Newrozê wekî ‘niha’ derdikeve ser dika dîrokê. Newrozên îsal û yên salên pêş xwedî girîngiyeke dîrokî ya bi vî awayî ne. Newroza 2026an ji rehên xwe ji nû ve zindî dibe, di kêliya niha de bi gaveke mezin ber bi demokratîkbûn û entegrasyona demokratîk ve dibe nûjen; rengê Newrozê werdigire. Cejna Newrozê, wekî di dîrokê de, ji nû ve zindî dibe, bandora xwe li dilê Rojhilata Navîn piştrast dike û careke din wekî sembola yekbûna demokratîk li seranserê herêmê rola xwe dilîze. Nuhabûneke girîng diqewime û ew ê berdewam bike. Newroz heta niha bi nirxên sembolîk dihat pîrozkirin. Niha, Newroz ne xewnekê yan jî utopyayekê temsîl dike, ew jiyaneke civakî ya pêkhatî û pêşketî temsîl dike. Newroz ew roj e ku em xwe hem ji hêla wateyî ve û hem jî ji hêla fîzîkî ve nas dikin. Em xwe di Newrozê de ji hemû têkilî û wateyên nebes ên ku bi berdewamî me aciz dikin paqij bikin û em jiyanê bi şêwazeke têkiliyê ya jêhatî, bi kûrahiya wateyê, bi exlaqekî nû ya azadiyê û bi têgihîştineke estetîk a nû hembêz bikin.

Em felsefeya ‘Jin, Jîyan, Azadî’ di hemû têkiliyên xwe de bixin pratîkê û jiyaneke azad bi dest bixin. Em fêm bikin ku Newroz êdî ne hêvî, xewn an teorî ye, ew kêliya sepandina pratîkî ye. Werin em bi hişmendiyeke jêhatî û kûrahiyeke temam a wateyê bersivê bidin vê kêliya sepandina pratîkî. Bi boneya Cejna Newrozê, di destê me de ye ku em vê salê veguherînin saleke azadiya rasteqîn ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn û kevneşopiya dostaniyê û hevgirtinê di navbera gelan de ava bikin. Em dikarin bi dawîanîna dabeşbûnên etnîkî û olî-mezhebî û pevçûnên birakujiyê û bi misogerkirina yekîtiya hemû çand û baweriyên olî li ser bingeha azadî û biratiyê vê yekê pêk bînin.

Li hember hilweşîna mezin a civakî û ekolojîk a ku ji aliyê modernîteya kapîtalîst ve hatiye afirandin, me girêdayî ruhê azadiya Newrozê çareseriyeke modernîteya demokratîk li ser bingeha siyaseta demokratîk, prensîbên ekolojîk û azadiya jinan pêş xist.

Em rê nedin ku Rojhilata Navîn ku çandê diafirîne, ji aliyê hêzên hegemonîk ve bibe qada şer. Wekî di dîrokê de çêbû, em dikarin îro jî bi hev re astengiyên li pêşiya vê çanda mezin ku bikare xwe bi awayekî azad îfade bike û li ser bingeha nasnameyên xwe yên rastîn entegre bibe, derbas bikin. Dema ku em nexweşiyên neteweperestî û mezhebî li dû xwe bihêlin û çanda dîrokî ya hevgirtinê ya hezar salan di navbera gelên xwe de xurt bikin, tu astengiyek namîne ku em nikaribin derbas bikin.

Mimkun e ku mirov bi ruhê yekîtiyê siyaseta demokratîk diyarî bike. Eger em bixwazin têkoşîna hezar salan a bindestan tacîdar bikin, cihê vê yekê li Rojhilat jî li Rojava jî ne di hawîrdora çandî ya kapîtalîst de ye, cihê wê hawîrdora azad a Rojhilata Navîn e. Em dikarin entegrasyona demokratîk li van axan li ser bingeha hevdîtineke rasteqîne û mirovahî, yekîtî, hevgirtin û dostaniyeke nû nûjen bikin.

Ez Cejna Remezanê li gelê me pîroz dikim û hêvî dikim ku ruhê cejnê, aştî û yekîtiyê geş bike. Newroza 2026an cara yekem e ku ji aliyê gelên me ve bi ruhê entegrasyona demokratîk, aştî û yekîtiyê tê pîrozkirin. Ez bi hemû hêza xwe piştgiriyê didim vî ruh û îradeyê û hêvî dikim ku Newroza îsal ku bi rastî jî heq dike ku wekî “Roja Nû” were pîrozkirin, di salên pêş de bibe wesîleya meşa biheybet; ez ji hemû gelên me re aştiyê dixwazim. Ez we hemûyan bi hezkirin silav dikim.

### Nameya Bafil Talebanî

Serokê Yekîtiya Niştimanî Kurdistan (YNK) Bafil Talabanî ji bo Newroza Amedê peyamek şand. Peyama Bafil Talabanî wiha ye: “Silav Kurd û Kurdistan, silav hevalên hêja, silav zarokên xweşik ku niha li wir sekinîne, silav heval Abdullah Ocalan, silav Serok. Cejna we ya Newrozê pîroz be, îşelah tim di cejnê de bin. Di vê dema hesas de ku girîng e, yekgirtîbûna me ye, yekgirtîbûna hemû Kurdan e yekgirtîbûna her çar parçeyê Kurdistanê ye. Silaveke taybet, rêzeke taybet ji bo hemû aliyên ku beşdarî projeya aştiyê ya heval Abdullah Ocalan daye destpêkirin. Îşelah di demekî herî nêz de têm xizmeta te heval Apo. Îşelah bername û plana te em ê bi hev re biqedînin. Îşelah di demekî nêz de em ê te bi awayekî azad bibînin. Hûn hemû dizanin Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) her tim bi we re bûye. Niha sozekê didim we her tim ji bo we dibe her tim ji bo we xebat dike û her tim li ser serê min û çavên min. Hûn bi xwe jî dizanin ku xwezayeke min heye ya ku dibêjim bi cih tînim. Soz didim we hemûyan. Saleke din hûn ê min bi video nebînin. Ez ê saleke din di xizmeta we de bim. Her bijîn. Cejna we pîroz be. Li ser ser û ser çavan.”

### Nameya girtiyên siyasî

Meşaleya azadiyê ku di şexsê Kawayê Hemdem Mazlûm Dogan de li dijî darbeya 12’ê Îlonê ya faşîst li zindanan bilind bû, li çiyayên Kurdistanê vegeriya têkoşîna mezin a azadiyê. Agirê bi vê berxwedanê mezin bû, ji gelan re bû ronahî. Bû romanek li ser zimanan digere û felsefeya Kurdên azad. Tevgera Azadiya Kurd her roj pêlên nû li kevneşopiya Newrozê zêde kir û têkoşîna azadiyê mezin kir. Serokatiya me Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk kêlî bi kêlî honandiye û xebatên pratîk û polîtîk ên înşayê dane destpêkirin. Em di şexsê Serokatiya xwe de Newroza gelê xwe yê welatparêz, hêzên xwe yên gerîla, dostên xwe û hemû rêhevalên di zindanan de bi dil û can pîroz dikin. Em hemû rêhevalên di dema pîrozbahiyên Newrozê de şehîd ketine bi rêzdarî bîr tînin. Em li ber bîranîna wan bejna xwe bi rêzdarî ditewînin û soza serkeftinê didin.

### Nameya Nêçîrvan Barzanî

Serokê Herêma Federe ya Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî ji bo Newroza Amedê peyamek şand Amedê, name wiha bû: Cejna Newrozê û sersala nû ya Kurdî, bi germî û ji dil, li hemû gelê Kurd û li we yên hêja pîroz dikim ku îro li vir, li Ameda rengîn ji bo pîrozkirina Newrozê kom bûne. Newroz sembola vejîn û îradeya jiyanê ye. Her wiha nîşandana hêviyên miletekî ye ku hertim têhniyê azadî û pêkvejiyanê bûye. Hêvîdar im ev cejn ji bo hemûyan bibe sedema xêr û aramiyê. Di demekê de ku em îro cejna Newrozê pîroz dikin, em dixwazin piştgiriya xwe ya dilsozane ji bo aştiyê tekez bikin. Pêkanîna aştiyê li Tirkiyê karekî dîrokî ye û ji bo berjewendiya herdu gelên Kurd û Tirk û tevahiya herêmê ye. Aştî; rêya yekane ye ku pêşerojeke geş ji bo nifşên me misoger dike. Em pir ji kevnde cîran û hevqeder in. Çarenûs û berjewendiyên me yek in. Tenê bi rêya pêkvebûn û aramiyê em dikarin bi ser astengiyan de serkevin û jiyaneke bi rûmet ji bo her kesî ava bikin.

### Nameya Mesrûr Barzanî

Serokwezwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî bi boneya Cejna Newrozê û Sersala Kurdî peyamek belav kir û cejn li hemû Kurdistaniyan pîroz kir û wiha gotibû: “Em xelkê Kurdistanê piştrast dikin ku em dê hemû şiyanên xwe ji bo parastina Kurdistanê û dûrxistina wê ya ji her metirsiyê bi kar bînin. Newroz ji bo gelê Kurdistanê sembola serkeftin, azadî, rûbirûbûna zordaran, hatina biharê û destpêkirina jiyaneke nû ye.”

### Nameya Mesûd Barazanî

Newroz ji bo gelê Kurdistanê her tim bûye mizgîniya destpêkeke nû û hêviyeke nû. Newroz serkeftina li ser zordar û zehmetiyan e. Ev yek wekî çandeke dewlemend a têkoşîna ji bo gihîştina bi aştî û azadiyê, di dîroka gelê Kurdistanê de rîşalên xwe kûr berdane. Di vê rewşa hestiyar û dîrokî de, ji her demê zêdetir pêwîst e aliyên siyasî hevaheng bin û alîkariya hev bikin. Ez hêvî dikim Newroza îsal ji bo aliyên siyasî bibe destpêka yekrêzî û biratiyeke zêdetir. Ez hêvî dikim gelên herêmê jî dûrî şer û aloziyan karibin di aştî û aramiyê de bijîn.

Hêjayî gotinê ye ku li her derê di êvara newrozê de gelê Kurd berê xwe dan goristanên şehîdan ên ku bi saya wan Newroz bi aramî û serbilindî tê pîrozkirin û mûma li ser gorê wan pê xistin. Ev yek nîşaneya ku şehîdên me zindî ne û em Kurd bi wan re hem şahî û hem şînî pîroz dikin, ji ber ew qehremanên Kurdisatanê ne.



**Farûk Sakik**

## Newroza 2026’an

Newroza sala 2026’an ji aliyê bi milyonan kesan ve hat pîroz kirin. Li her qadê rengek û dengek cûda hebûn. Lê ya herî girîng di hemûyan de rihê Kurdistanî hebû.

Raste, Newroz xwedî gelek vateyan e. Newroz bi rengên cûda tên pîrozkirin. Lê hetanî gihîşt esas maneya xwe bedelên giran jî hatin dayin.

Agirê Newrozê yê B.Z. di 612’an de ji aliyê Kawayê Hesinkar ve piştî têkbirina Dehaqê zalim vêket, bi hezaran sal e her tim wek cejna berxwedanê ya gelê kurd tê pîrozkirin. Her sal 21 Adarê roja Newrozê wek rojek şahî dihat pîrozkirin. Newroz wê demê şahiyek li dora agir bi reqs û govend bû. Aliyê Newrozê yê serhildanê nedihat zanîn. Bi tenê digotin, di dîrokê de ev roj kurdan dibin pêşengtiya Kawayê Hesinkar de, li dijî zilimkar Dehaq serîhildaye. Dawî li zilma wî aniye û ewroj bûye cejin.

Di salên borî de anjî di demên kevin de wek şahiyek dihat pîrozkirin. Aliyê Newrozê yê netewî zêde dernediket pêş. Wek cejnek bû.

Her wiha di salên bêdengiyê de ji ber zextên rejimê jî, cejna Newrozê li gelek deveran hatibû jibîrkirin. Heta salên dawîn jî li gorî atmosfera polîtîk tenê komên siyasî vê cejnê pîroz dikirin. Û li dora agirê Newrozê govend digerandin. Çend dirûşmeyên Kurdistanî jî ji bajaran dûr li lutkeyên çiya bilind di bû.

Lê aliyê Newrozê yê netewî nedihat zanîn. Mixabin dijmin û dagirkerên Kurdistan beriya me, bi aliyê wî yê netewî hesiyan. Dijmin, di çîrok-mîtolojiya Newrozê de motivên neteweyî dîtibûn.

Kurd di 21’ê Adarê de derdiketin serê çiya, agir pêdixistin û li dora vî agirî govend digerandin. Li hin herema jî diçûn seyranê. Û ev yek çima dijmin aciz dikir? Lê wan dizanibû rojek Kurdên vateya vê rojê biguhêrine roja serhildana Kurdan. Roja destpêka têkoşîne. Roja destpêkirina armancên xwe.

Bi Mazlum Dogan re ev pîrozbahî û vateya vê rojê hat guhertin. Mazlûm Dogan li ser vê rojê lêkolînek kûr û bi wate kiribû. Di encama vê lêkolînê de dîtibû ku ew roj destpêka serhildaniye. Kawa ew roj pêngava rizgariya ji bin zilma Dehaq dabû destpê kirin û bi demê re biserketibû Mînaka çalakiya Mazlûm Dogan a roja Newza 21’ê Adara 1982’an jî wiha ye. Ewroj li zîndana Amedê starta berxwedanê da destpêkirin.

Ji wê rojê hetanî roja me, hersal di Newrozan de hedefek didinpêş xwe. Hevalên Mazlûm Dogan, tevgera azadiyê li Newrozê xwedî derketin. Vateya Newrozê bi hemû Kurdan dane fahmkirin.

Ev bi milyonan Kurdên îroj li qadên pîrozbahiya ku tên cem hev heger aliyê Newozê yê sekna siyasî esas negirtina, wê herkesê li mala xwe, li gundê xwe, li çiyayê xwe wek komek biçûk pîroz bikirina.

Pîrozbahiyên ku bi salane dijmin dida tirsandin ev Newrozên girseyî bû. Ji bo vê yekê pîrozbahiyên girseyî dihatin qedexekirin.

Ev dijminên Kurdistanin tê fahmkirin. Lê hin alî-kes bi israr pîrozbahiyin girseyî siyasî-îdeolojîk dibînin. Dixwazin alternatîf pîrozbahiyan mêjuyê civakê şêlû dikin lidarbixin.

Îsal di pîrozbahiyan de temaya yekitiya netewî derdiket pêş. Di pêvajoya şerê Rojavada ew rihê ku Kurdistaniyan derxist qadan, heman rihî wan derbasî qadên Newrozê jî kir.

Heger Kurdistan azadbûya û li pêşiya wan tu hedefên azadiyê nemana Kurdan wê bi tenê wek şahiyek pîroz kirina. Wê motîfên siyasî cîh negirtina. Lê ne wisaye hên statuya Rojava nehatî mîsogerkirin. Rojhilatê Kurdistan di germehiya şerê Îran-Îsraîl-Amerîka de ye. Li Bakûr aqûbeta pêngava aştî û civaka demokratîk hên nediyare. Her tişt li aliyek, Newroza 2026’an bi armanca xwe hat pîrozkirin.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**



Ji destpêka tevgera rizgariya neteweyî ya kurdan di sedsala borî de, nivîskar û helbestvanan di berevaniya zimanê Kurdî, parastina nasnameya xwe, belavkirina hişmendiya netewî û tekezî li ser rewatiya tekoşîna ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd, roleke sereke lîstine, wan di helbest û nivîsên xwe de xemên civaka xwe hilgirtin, xewn, hêvî û derdên wê xêz kirin û gotin kirin menberek ji bo dozê û wêje jî kirin dengê mirovan.

Di vê çarçoveyê de helbestvanê Kurd Hozan Girkundê yek ji wan dengên ronak yên ku bi rastî berdewamîya rêya Wêjeya Neteweyî şopandi derdikeve pêş, wî pênûsa xwe kir pirek di navbera mirov û welat û di navbera helbest û dozê de; wî nivîsa xwe ji bo xizmeta gelê xwe terxan kir, lewra helbest di ezmûna wî de bû peyamek ku riya hişmendiyê ronî dike û girîngiya doza kurdî bilind dike.

Helbestvanê kurd Hozan Girkundê di sala 1971ê de ji dayîk û bavek kurd (Seîd û Emîna) li gundê Girkundê yê girêdayî bajarê Dirbêsiyê hatiye dinyayê: ew bajarê ku dikeve li ser sînorên Rojava û Bakurê Kurdistanê ,di topografya xwe û bîra xwe de nîşan û şopên çand û şaristaniyên li pey hev hilgirtiye yên ku li ser ax û mirovan bandorek mezin û kûr hiştine,zinarên wê hê jî bêhna Mîtanîyan û Medyayan jê dibarin û kevirên wê bi mîrateya Sûbarîyan û Hurriyan dilepitin, ji demên kevnar de, ew rêgehek bû ji bo ronahî û zanînê, beşek bingehîn bû ji mîrateya Bedirxaniyan û Botaniyan û ji ruhê şoreşa wan a çandî re .

Ew di himbêza malbateke kurdperwer, neteweyî û xebatkar de mezin bû, malbatek ku ji du bira û xwişkekî pêk dihat, dê û bavê wî ew bi nirxên welatparêzî, hezkirina axê û dilsoziya bi welat re mezin kirine. Ev nirx tovê yekem bûn ku hişmendiya wî ya mirovî û wêjeyî ava kirin.

Dirbêsiyê di dirêjahiya rêwîtiya xwe de gelek nivîskar û helbestvanên ku wêjeya Kurdî dewlemend kirine û di parastina ziman û nasnameyê roleke girîng lîstine, anînê jiyanê wek (Mihemed Elî Şakir, Xemgîn Ramo, Erşef Oskan, Ciwan Evdal) û yên din ên ku peyv kirine çiraxek ku rê ji nifşan ronî bike, û şemalek rêyan ronahî bike di demên tarî de.

Di hembêza gundê Girkundê de û di nav deştên wê yên rengîn de , yekem têkiliya Hozan û peyvê bi hevdû re çêbû, têkiliyek ne hema tenê nivîsandinbû , lê sozek bêdeng bû di navbera wî û zimanê dayikê de .

Li wir, ku sadebûna gundan bi pîrozbahiya axê re tevlîhev dibe, hestê wî yê yekem bi peyvê re ava bû û bi derbasbûna salan girêdana wî ya bi zimanê kurdî re veguherî pabendbûneke kûr, çimkî ew li cem wî ne tenê navgînek ji bo îfadekirinê bû, lê nasname, girêdan û berpirsiyarî bû.

Hozan zarokatiya xwe li deverên gundê xwe yê bedew, di navbera deşt û zeviyên fireh ên ku wek tîrêjên ronahiyê li ser rûyê erdê dirêj dibûn û di nav bênderên genim ên zêrîn ku di bin tava havînê de dibiriqîn, derbas kir.

Ew di nav kolanên teng ên gund de digeriya ku bêhna nanê germ û axa ku şilbibû bi xunava sibê, wê bênxweşiyê di dilê wî de şopeke newê jibîrkirin hiştibû, germahiya rojên destpêkê vedigerîne li bîra wî. Di wî cîhî de ku aramiya gundan û bêgunehiya wê bi hev re têne civandin û di navbera vedenga bajarê nêzîk û qelebalaxa wê ya ku sînorên gund derbas dike, tê bihîstin, hêdî hêdî taybetmendiyên hişmendiya wî dest pê kir.

Li wir di navbera bêdengiya xwezayê û rehjena jiyana rojane de, xeyala wî yê yekem hat çêkirin û çavên wî li ser bedewiya tiştên sade vebûn. Ew bedewî paşê bûn beşek ji tîna ristên wî û ruhê helbesta wî.

Meyl û hewesa wî ya wêjeyî di temenekî biçûk de, dema ku xwendekarê dibistana amadehî bû, dest pê kir, di bin bandora helbestvanên kurd ên klasîk ên wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cezîrî, Feqîyê Teyran û helbestvanên hevdem ên wekî Cegerxwîn,Tîrêj, Fetah Ellah Huseynî, Yûsif Birazî, Şêrko Bêkes, her wiha wî di helbestvanên Erebî de pencereyek din dît ku li ser bedewiyên ziman û ruhê helbestê vedike mîna Nizar Qebbanî, Mehmûd Dervêş, Cibran Xelîl Cibran.

Di sala 1990’an de wî gava xwe ya yekem li ser rêya helbesta bi Kurdî avêt, tovê dengê xwe di warê afirînerîyê de çand , dest bi rêwîtiyeke dûr û dirêj a nivîsandinê û lêgerîna bedewiyê kir. Rêwîtiyek ku di nav helbestvanên kurd de navê wî bi cih kir, û peyv kir pirek di navbera dil û welat û di navbera xewn û rastiyê de.

Hozan Girkundê gavên xwe yên pêşîn ên ji bo nivîsandina helbestê ji stranên çotkaran li zeviyan û ji nalîna Kehr ,berx û miyan li deştan girtiye, ew dengên sade bûn tovên helbestên wî û di cîhana awaz û peyvan de deriyên xeyalê li ber wî vekirin.

Her wiha wî ji awazên bilûrên şivanan li mêrgan îlhama muzîka helbesta xwe ya yekem wergirt, ew awazên gundîtî yên xwebexş bûn rîtma yekem a lêdana wî ya helbestî.

Ji lawirên jinan ên di dawetan de û ji sirûdên palevanan di demsala dirûnê de fêrî wê israra kurdî bû ku westandinê dike stran û xwêdanê dike helbest.

Ji kaniyên gundê xwe bi deşt, gelî û germahiya xelkên xwe û ji nirxên ku malbata wî di dilê wî de çandibûn gav bi gav hişmendiya xwe ya wêjeyî ava kir, heta ku peyv ji bo wî bû dirêjahiya xwezayî ya giyan û dengek ku wekî koka wî û hem jî xewna wî.

Bi vî awayî rêwîtiya xwe ya dûr û dirêj bi helbestê re dest pê kir. Rêwîtiya afirînerekî ku bawer dikir, peyv xwediyê dilekî ye ku dikare gelan biparêze, helbest xwediyê baskên ku dikarin li ser sînoran bifirin , ji bo ku bi bîr bîne nasnameya ku bi xîmavê hatiye nivîsandin di her beyteke helbestê de ku ji hêla helbestvanekî dilsozê axa xwe ve hatî nivîsandin ji nû ve çêdibe.

Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe Girkundê û ya amadekarî li bajarê Dirbêsiyê qedande.

Li wir, di nav kolanên bajêr û aramiya gundewariyê de, tovê helbestê di giyanê wî de şîn dibe,wî bi baldarî guh dida li çîrokên mezinan û stranên gelêrî yên kurdî , peyv li ber çavên wî mîna çûkên ku li cihekî firehtir digeriyan, çêdibûn.

Lê belê, şert û mercên aborî û siyasî ,ji ber ku ew ji nasnameya Sûriyê bêpar bû ew neçar ma ku dev ji xwendina xwe berde berî ku riya xwe ya akademîk biqedîne Lê belê, wê yekê ne agirê zanînê di nava wî de vemirand, ne jî ew ji hewesa wî ya ji bo wêjeya û hezkirina wî ya kûr a ji bo zimanê kurdî dûr bêxe ,ku ew ziman ji bo wî welatê herî pak û wateya wî ya herî kûr dimîne.

Helbestvan Hozan bi şêweyên curbecur helbest nivîsiye ,ji helbesta kilasîk a bi rêzbend û kêşe heta helbesta nûjenç azad û pexşan, bi zimanekî nazik di rîtmê de , sade di çêkirine de û kûr di wateyê de. Bi vî awayî, wî dengekî helbestî yê taybet avakir ku di navbera romantîk û rastiyê, xeyala dil û bîhna axê de hestan tevlihev dike û di helbesta xwe de ew hestê mirovan û rehjena cihan bi hev dicivîne.

Helbestvan Hozan heşt dîwanên helbestan weşandine ku bûne rawestgehên diyar di rêya afirîneriya wî de:

1. Evîna Vejandî (1997)
2. Ne payîzê daristanan diweşînin (1999)
3. Vehesînek li ber delavên çavên dilberê (2006)
4. Bihnek ji sirûşa peyama te (2016)
5. Çend wêne ji şengewîna gundê min -(2018)
6. Vedenga Hestan (2018)
7.Hinasên Te 2025
8. Heyal (2025).

Û li kêleka berhemên wî yên helbestî, pirtûkek wergerandî bo erebî jî derketiye binavê:(Eşqa sermedî û destana êşê) - (2013), ku ji aliyê Mesûd Dawûd ve hatiye wergerandin.

Helbestvan Hozan xebatên xwe yên li ser destnivîsên nû jî didomîne, yên herî berçav ev in:

1- Şepolên Bîranînan
2- Hîna Zû Bû.

Hozan tu carî ji warê çandî û hunerî dûr nebûye, lê hertim amedebû wekî hebûna dil di bedenê de, ew beşdarî hejmareke mezin ji kom û komeleyên çandî û hunerî bûye, wek: (Mîtan - Xanî - Ronahî - Waşo Kanî - Şehîd Walat - Azadî - Xabûr - Serîkaniye); ev hemû rawestgeh bûn ku di pêşxistina tecrûbeya wî ya helbestî de û geşbûna hestê wî yê hunerî de rolek girîng lîstin. Her wiha di sala 1996’an de ligel komek helbestvanên navdar di nava Komeleya Ziwê de beşdar bûye di gel: Arşev Oskan, Xemgîn Ramo , Mîdas Ezîzî, Ciwan Evdal, Îbrahîm Berces, Hemîd Şerîf û Zeynep Azîzî;

Vê beşdarbûnê bandoreke zelal di berfirehkirina xeleka edebiyata wî de û xurtkirina pêwendiya wî bi tevgera helbesta kurdî re kir. Di heman demê helbestên wî di gelek kovar û rojnameyên çandî de hatin weşandin, mîna: (Zanîn - Zevî - Buhar - Zîn - Peyv - Babîsok - Rojda - Pirs - Walat - Şermola - Xebat - Riya gel - Dengê kurd). Vê yekê dorhêla hebûna wî ya torevanî berfirehtir kir û pêwendiya wî bi xwendevan re xurt kir.

Bi ser de jî, beşdarî gelek bernameyên televizyonî û radyoyî bûye, û çendîn goftûgoyên çandî pêşkêş kirine, ku roleke bibandor di vejandina bizava wêjeyî û dewlemendkirina qada çanda Kurdî de lehîstin.

Her wiha Hozan Girkundê helbesta stranbêjiyê bi şêwazek bedew û hêja nivîsîye, ku gelek hunermendên kurd ji peyvên wî awaz çêkirine. Bi dehan dengên kurdî ji helbestên wî gotine, ji wan:( Mehmûd Ezîz, Ûmîd Silêman, Robar Heso, Husên Salih, Şêrîn Salih, Ey Dil, Mihemed Şêxmûs, Nisrîn Serêkaniyê, Sumiya Mihemed, Reşad Kobanê,
Mesûm Şikakî, Zozanî, Mihemed Elî Şaker, Şeyda û Ronîcan). Herwiha çend komên mûzîkê jî berhemên wî pêşkêş kirin û hebûna helbesta wî di qada stranbêjiyî û çandî ya kurdî de piştrast kirin.

Hozan di sala 2005’an de zewicîye ew bavê du zarokaye(Elend û Hewlêr), ku ew bûn berdewamîya jiyana wî ya germ ya mirovî li kêleka helbest û peyvan.

Serpêhatiya Hozan Girkundê tê nasîn bi berdewamîya ruhê kurdewarî yê ku tevî êşê jî li bedewiyê digere, wî li ser evîn û jinê, li ser welat û xeyalên azadiyê, li ser êşa kurdan a nifşan, li ser dûrketin û çûyînê û êşa veqetîna ji dayîk û şehîdan nivîsîye.

Wî her wiha li ser Kurdistanê û bedewiya wê û li ser gundê xwe bi ruhekî mirovî yê zelal nivîsiye ku ew dever kiriye hebûnek jîndar, xwezaya wê bi rengên bedew di helbestê de xemilandiye , lewra helbest wekî neynikek xuya dike ku kûrahiya wijdan û hevgirtina mirov bi axê re vedibêje.

Helbestvan Hozan çend pirtûk û dîwanên helbestan bi zimanê Kurdî nivîsandine û pirtûkxaneya Kurdî dewlemend kiriye û hebûnek wêjeyî ya berçav li wê zêde kiriye, û navê xwe xêz kiriye wek yek ji dengên ku bi zimanê dayika xwe bi dilsozî û afrînerî nivîsandiye.

Îro jî piştî rêwîtiyeke dûr û dirêj a lêkolîn, nivîsandin û xeyalê, helbestvan Hozan hê jî di xurtbûna afirînerî û dayîna xwe de ye, ew bi dilsoziyek kûr helbestên xwe vedihûne bi zimanê xwe , nasnameya xwe û serpêhatiya xwe ya ku roj bi roj geş dibe, û piştrast dike ku helbestvanê rastîn ne bi hejmara pirtûk û berhevokan tê pîvandin , lê bi hêza wî ya ku dikare peyvê veguherîne jiyanek zindî ku qet nayê vemirandin.

# Li Qamişlo tevgera avakirin û lêkirinê geş bûye

Îsal li Qamişlo di sektora avakirinê de geşbûneke berbiçav hatiye dîtin, herwiha tevgera lêkirinê hêdî hêdî piştî demeke ji rawestandinê, dîsa vedigere. Ev yek başbûneke rêjeyî di bazara xanûberan û aramiya buhayên madeyên lêkirinê yên bingehîn nîşan dide.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Tevgera avakirin û lêkirinê li bajarê Qamişlo bi awayekî berbiçav geş bûye û li gorî sala borî îsal tevger berfireh bûye, berovajî sala borî ku ji ber rewşa ne zelal a welêt û metirsiyên şer hatibû rawestandin. Di mehên dawîn yên sala 2025'an de tevgera avakirinê hat dest pê kirin û hêdî hêdî projeyên avakirina avahiyên nû berfireh û zêde bû di heman demê de bi aramiya nisbî ya buhayên kel û pelên lêkirinê yên bingehên hevdem bû.

Sektora avakirinê li bajarê Qamişlo îsal li gorî sala borî çalakiyeke zêdetir nîşan dide. Herwiha gel û kesên eleqedar bi xanûberan vegera berbiçav a çalakiyên avakirinê li gelek taxên bajêr dîtine. Ev başbûn piştî demeke ji rawestandina çakaliya nisbî ya sektora avakirinê di piraniya mehên 2025'an de jiyan kir, tê.

### Tevger û rastiya avakirinê

Li gorî peymankaran, çalakiya avakirinê di sala 2025'an de pir kêm bû, ji ber ku projeyên avakirina nû ji ber çend şert û mercên aborî û jiyanê, ji bilî rewşa bendewariyê ya ku di wê demê de di nav veberhêner û xwediyên sermayeyê de serdest bû, bi awayekî mezin kêm bûn.

Lêbelê, di mehên dawî yên sala 2025'an de dest bi başbûneke gav bi gav di çalakiyên avakirinê de hat kirin, ji ber ku hin veberhêner û xwediyên erd dest bi vegera pêkanîna projeyên nû yên niştecîhî kirin, ku ev yek di destpêka vê salê de bi awayekî xurttir xuya bû. Peymankarek ji bajarê Qamişlo piştrast dike ku bajar niha hejmareke zêde ya avakirinê dibîne ku li ser avakirina avahiyên niştecîhî yên pirqatî dixebitin.

Projeyên avakirinê li gelek deverên bajêr belav bûne, nemaze li taxên ku berfirehbûna bajarî ya berdewam dijîn, ji ber ku gelek şênî hewil didin ku di sektora xanûberan de wekî yek ji sektorên herî ewledar veberhênanê bikin, da ku nirxa pereyan di ber çavan re derbas bikin, di çaroveya şert û mercên aborî yên guherbar de.



### Buhayên kelûpelên bingehîn ên lêkirinê

Li gorî çend pisporên karsazên avahiyan, tevî zêdebûneke berbiçav a di çalakiyên avakirinê de ji bo îsal, buhayên madeyên bingehîn ên avakirinê li gorî sala borî guherînên girîng nedîtine. Buhayê tonek hesin li dora 750 dolarê Amerîkî sabît maye, ku bi qasî sala borî ye herwiha di hin demên diyarkirî de ji ber guhertinên di peydakirin û daxwazê de tenê guherînên piçûk hene.

Di heman demê de buhayê tonek çemento bi qasî 110 dolarê Amerîkî ye, ev buha jî di van demên dawî de nisbetên sabît maye. Çemento yek ji madeyên herî bingehîn a avahiyê ye, ji ber vê yekê îstîqrara buhayê faktorek girîng di teşwîqkirina çalakiyên avakirinê de dike.

Derbarê madeyên din ên avakirinê de, buhayê yek blokek nêzîkî 35 sentan e, buhayek ku ji bo peymankar û karkerên di vî warî de nisbetên maqûl tê hesibandin, her çend lêçûnên avakirinê yên giştî ji bo beşek mezin a gel hîn jî bilind in.

Hin karsazên di warê avahiyan de dibînin ku aramiya van buhayên madeyan di vegera çalakiyê de ji bo bazara xanûberan rolek lîstiye, ji ber ku guhertinên mezin ên buhayê pir caran dibin sedema rawestandin an paşxistina projeyên nû.

### Lêçûna avakirina avahiyan

Lêçûna avakirina avahiyên niştecihbûnê li Qamişlo li gorî çend faktoran tê guhertin, di nav wan de rûbera erd, hejmara qatan, cûreya madeyên avahiyê, wekî din lêçûna karsazên avahiyê û xizmetên girêdayî projeyê. Lêçûna avakirina avahiyek çar qatî dighêje ji 120 hezar dolar heta 200 hezar dolar.

Ev lêçûn bi gelemperî girêdayî karê bingehîn ê avahîsaziyê ye. Ev qonax tiştê ku wekî bingeh û karê avahîsaziyê tê zanîn, wekî kolandin, rijandina bingehên betonê û danîna stûn, dîwar û banan digire nav xwe, ew qonaxek ku beşa herî mezin a lêçûnên avakirinê pêk tîne. Qûnaxên paşîn, wekî karê qedandina hundurîn, di nav de danîna kaşî, boyaxkirin, derî, pencere û sazkirinên elektrîkê, ku li gorî kalîteya madeyên ku têne bikar anîn û asta qedandina xwestî lêçûnên din zêde dikin.

Peymankar dibînin ku lêçûnên avakirinê yên heyî hîn jî li gorî hêza kirînê ya gelek şêniyan nisbetên bilind in, ev yek jî dike ku xwedîtiya xaniyek an avahiyeke ji bo piraniya malbatan plansaziyek darayî ya demdirêj hewce dike.

Lêbelê, veberhênana di avakirin û milkên nekêşbar de ji bo hin veberhêneran vebijarkek bijarte dimîne, nemaze ji ber ku vebijarkên din.

Di çarçoveya daxwaza berdewam a ji bo xanîyan di nav bajêr de, peymankar li bendê ne ku çalakiyên avakirinê di serdema pêş de berdewam bikin, nemaze eger buhayên madeyên avahiyê di asta xwe de ya heyî bimîne û zêdebûnên mezin çênebin ku bandorê li ser şiyana veberhêneran bikin ji bo pêkanîna projeyên nû.



### Kêmbûna çalakiya avakirinê di salên borî de

Tevgera avakirinê li herêmê di salên borî de ji ber rewşa ewlehiyê ya xirab û bilindbûna buhayên madeyên avakirinê yên wekî çîmento, hesin û yên din herwiha kêmbûna karkeran ji ber pêla koçberiyê ber bi Ewropa û welatên cîran ve ku li herêmê çêbû, kêm bibû.

Şerê ku bi salan ê li Sûriyê bandorek giran li ser aboriyê kiriye, êdî bû sedema daketina nirxa lîreya Sûriyê li hember dolarê Amerîkî. Herwiha şerê ku li herêmê derket û heya niha encamên wê berdewam dike, hişt ku bazara reş geş bibe, buhayan ferz bike û derfetan ji bo bazara reş biafirîne.

Girtina deriyên bejahî, zehmetiya hawirdekirina madeyên avahiyê û bacên ku li ser kamyonên ku madeyên wekî hesin û çîmentoyê hildigirin hatin ferz kirin, hemî di salên dawî de bibûn sedema kêmbûna çalakiyên avakirinê.

Şerê li Sûriyê, ku di sala 2011'an de dest pê kir, heta sala 2023'an bû sedema hilwişandineke berfireh a binesazî û avahiyan. Li gorî texmînên navneteweyî, nêzîkî sêyeka sermayeya veberhênanê ya berî şer; zirar dîtiye di heman demê de bi wêraniyeke girîng a rê, elektrîk, xanî û sektora aborî bi giştî, ku gelek projeyên avakirinê bi awayekî pratîkî ne mumkin kiriye. Şer û pevçûna ku li welêt qewimî hişht ku bandorek kûr li ser aboriyê bike; hilberîna herêmî ya Sûriyê di navbera salên 2011 û 2023'an de bi awayekî mezin kêm bû, ev yek pereyên berdest ji bo veberhênan û avakirinê bi giranî sînordar kir. Ev tengbûna aborî tê vê wateyê ku ne dewlet û ne jî kes di wan salan de nekarîbûn projeyên mezin an demdirêj fînanse bikin.



# Li Sûriyê mezheb dibin amûrê dewletên herêmî û navneteweyî

Sûriyê welateke ku bi cihêrengiya xwe ya dînî û mezhebî tê naskirin. Ev cihêrengî dikare hem bextewariyek çandî û civakî be, hem jî di hin şertan de bibe sedema pevçûnê. Lê li Sûriyê mezheb ne sedema bingehîn a şer bû, ew bû amûrek dewletên herêmî û navneteweyî ku heya roja îro tê bikaranîn. Lê rêzgirtina cihêrengiya mezhebî ji bo aştî û aramiya welêt pir girîng e.



**Ronaz Silêman**

Sûriyê yek ji wan welatan e ku di Rojhilata Navîn de bi cihêrengiya xwe ya etnîkî û dînî tê naskirin. Ev cihêrengî di mezhebên Îslamî, komên Mesîhî û olên din de xuya dibe. Di vê raporê de em ê li ser cureyên sereke yên mezhebên li Sûriyê, rêjeya wan, rolê wan di civak û siyaseta welêt de, herwiha bandora wan li ser rewşa nûjen a welat şîrove bikin. Di destpêkê de, divê were gotin ku piraniya gelê Sûriyê misliman in û di nav wan de mezheba Sunî herî zêde ye. Sunî ji sedî nêzîkî 70 heya 75 ji gelê welat pêk tînin. Ev kom li hemû herêmên Sûriyê belav bûne û di nav wan de Ereb, Kurd û komên din jî hene. Sunî bi giştî di dîroka Sûriyê de rolek girîng di bazirganî, perwerdehî û civaka giştî de lîstine. Ji aliyê din ve, komên Şîe jî li Sûriyê hene, lê rêjeya wan kêmtir e. Di nav wan de gelek caran komên wek Alewî tên zanîn. Alewî ji sedî nêzîkî 10 ji gelê Sûriyê ye, bi taybetî li peravên Rojava yên welêt (wek Laziqiyê û Tertûz) dijîn. Ev kom di siyaseta Sûriyê ya nûjen de rolek pirr girîng heye, bi taybetî ji ber ku gelek serokên siyasî ji vê mezhebê hatine.

Herwiha, komên din ên Îslamî wek Dirzî jî li Sûriyê hene. Dûrzî ji sedî nêzîkî 3 ji gelê welêt pêk tînin û zêdetir li herêma Jabal al-Dirûz (li başûrê welêt) dijîn. Ev kom bi xwe re ol û kevneşopiya taybet heye û di dîroka Sûriyê de bi berxwedan û parastina xwe tê naskirin. Ji bilî komên Îslamî, Sûriyê welatek e Mesîhî jî tê de hene. Berî şerê Sûriyê, rêjeya wan ji sedî nêzîkî 10'an bû, lê piştî şerê 2011'an ev rêje kêm bûye ji ber koçberî û rewşa ewlehiyê. Di nav komên Mesîhî de, gelek mezheb hene wek Ortodoks, Katolîk û komên din. Ev kom ji dîrokeke dirêj li herêmê hene û beşek girîng ji mîrasa çandî û dînî ya welat pêk tînin. Di heman demê de komên olî yên biçûk jî li Sûriyê hene. Di nav wan de Yezidî tên zanîn ku bi taybetî li bakurê welêt dijîn. Her çendî rêjeya wan pir kêm e jî, lê ew jî beşek ji cihêrengiya olî ya welêt ne. Di heman demê de, komên din wek Ismailî jî li hin herêmên welêt dijîn.

### Mezhebperestî li Sûriyê

Di şerê xwînî yê Sûriyê de ku ji sala 2011'an vir ve berdewam dike, mezhebperestî derketiye holê ku gelek kes wê bi reh û hûrguliyên şer şîrove dikin. Lewra hin kes bawer dikin ku şerê Sûriyê ji teqîna 15 salan a tengezariya mezhebî wêdetir tiştek nebû. Lê gelo ev mezhebperestî bi rastî jî çirûska ku şer pêxist, an jî tenê agirê gur ê ku ji hêla şerê berdewam ve hatiye geşkirin û ji hêla rejîmê ve hatiye bikar anîn bû? Ji bo bersiva vê pirsê, divê em sedemên rastîn ên şoreşa Sûriyê û bûyerên wê û ka nasnameyên mezhebî çawa bi şer re têkilî danîne, lêkolîn bikin. Wêne ne reş û spî ye, ew tevlîheviyek a rehên kûr ên siyasî, aborî û civakî ye ku bi nakokiyên mezhebî ve girêdayî, ne ku berî şer bêçalak bûn û dûv re di dema şer de derketin holê.

### Mezhebperestî di şerê Sûriyê de

Dema ku şoreşa Sûriyê di sala 2011'an de hat lidarxistin, ew qet ji hêla mezhebî ve nehat ajotin. Sûrîyî ji hemû beşên jiyanê piştî 10 salan desthilatdariya otorîter, bi bandora pêla tiştê ku wekî "Bihara Erebî" li herêmê hat zanîn, derketin kolanan û daxwaza azadî, rûmet û baştirkirina şert û mercên jiyanê kirin. Di destpêka şoreşê de, xwepêşanderên aştiyane li ser slogana yekîtiya neteweyî û nasnameyek neteweyî ya yekgirtî bû, ev yek jî eşkere bû ku cûdahiyên mezhebî ne hêza sereke ya li pişt xwepêşandanên gel bûn. Bingeha şoreşê serhildanek giştî ya gel li dijî zor û gendeliyê bû, ne li dijî komek taybetî. Xwepêşanderan dixwestin ji dîktatoriyê xilas bibin bêyî ku girêdayîbûna mezhebî ya serokê rejîmê çi be. Rast e ku kontrola dezgehên tepeserkirinê yên dewletê ji hêla endamên mezhebek taybetî ve dihat kirin û ev yek di nav gelek kesan de hestek çêkir ku rejîm mezhebî ye. Lêbelê, rejîm bi xwe ne di serî de sîstemeke olî an mezhebî bû, sîstemeke otorîter bû ku ji aliyê malbata Esed û derdora wê ya nêzîk ve dihat birêvebirin.

### Pirên baweriyê yên mezhebî hatin xerakirin

Bi veguherîna şoreşa aştiyane bo pevçûneke çekdarî û şerekî tevahî, kabûsên herî xirab ên mezhebperestiya veşartî, derketin holê. Di salên şer de, welat şahidiya binpêkirinên hevbeş û êrîşên bi xwezaya mezhebî ji aliyê aliyên cûda ve kir, vê yekê pirên baweriyê di navbera pêkhateyên cûda yên civakê de xera kir. Raporên nûçeyan ên li ser komkujiyan, paqijkirina etnîkî, koçberkirina bi zorê, revandin û şîdeta cinsî li ser bingeha nasnameya olî belav bûn. Tawan û binpêkirinên weha hestên tirs û nefretê di navbera mezheban de kûrtir kirin û hêviyên ji bo lihevhatinek qels kirin. Agirê nakokiyên mezhebî ji hêla gotinên nefretê û teşwîqkirina mezhebî ve ku bi şer re dihat, bêtir hate gur kirin. Bi vî rengî, şerê Sûriyê nakokiyên mezhebî li Sûriyê pêş ket.

### Mezhebên Sûriyê bi salan bi hev re dijîn

Cihêrengiya mezhebî li Sûriyê ne tenê taybetmendiyek civakî ye, belkî di siyaseta welêt de jî bandorek mezin heye. Di demên dawî de, bi taybetî piştî destpêka şerê Sûriyê di sala 2011'an de, ev cihêrengî bûye yek ji faktorên girîng ku bandor li ser pevçûnên navxweyî kiriye. Her çendî sedemên şeran pir in (wek siyasî, aborî û civakî), lê cihêrengiya mezhebî jî di hin rewşan de wekî faktorek zêde tê dîtin. Lê divê were zanîn ku berî şerê Sûriyê bi gelemperî wek civakek ku mezhebên cuda bi hev re dijîn tê naskirin. Di gelek bajaran de ji mezhebên cuda bi hev re di heman herêman de dijîn û têkilîyên civakî yên baş hebûn. Ev têkilî di dîroka dirêj a welêt de pêşve çûne.

### Dewletên navxweyî û navnetewî cihrengiya Sûriyê kirin xizmeta berjewendiyên xwe

Di Sûriyê de, cihêrengiya mezhebî ne tenê taybetmendiyek civakî ye, herwiha di siyaseta welêt û têkiliyên herêmî de bûye amûrek girîng. Lê dewleta Sûriyê û dewletên derve ev cihêrengî ji bo berjewendiyên xwe bikar anîne. Rêjîma Sûriyê ya têkçûyî û hikumeta demkî ya niha jî di gelek deman de stratejiyek ku tê gotin "parçe bike û rêve bibe" bikar anîye. Ev stratejî li ser vê yekê ye ku komên civakî ji hev dûr bike, da ku nikarin bi hev re li dijî desthilatê rawestin.

### Rola dewletên derve

Şerê Sûriyê ne tenê navxweyî bû, lê bû şerek herêmî û navneteweyî. Ji ber gelek welat li gorî berjewendiyên wan destê xwe kirin vî şerî de.

### Mezheb wek amûrê propagandayê tê bikaranîn

Di şerê Sûriyê de, mezheb bûye amûrek propagandayê ku rêjîma têkçûyî xwe wek parastina komên biçûk nîşan da.

Opozîsyon hin caran xwe wek parastina Sinî nîşan da. Medyayên herêmî û navneteweyî jî ev cihêrengî zêde kirin. Ev jî bûye sedem ku ne tenê şerê siyasî, lê şerê mezhebî jî bihêz bibe.

### Encam û bandor

Bikaranîna mezhebê di siyaseta Sûriyê de gelek encamên girîng hene ew jî ev in: Civak ji hev hat parçekiri. Têkiliyên civakî xerab bûn û bi milyonan kes koçber bûn. Ji ber van sedeman heya niha kirîza Sûriyê nehatiye çareserkirin û şoreş derbasî şer bû, herwiha gelek wêraniyên mezin di Sûriyê de ji sala 2011'an heya niha hatine kirin. Ji ber heya niha hemû desthilatdarên Sûriyê cihrengiya Sûriyê naparêzin û aliyekî didin pêş, ev jî dihêle şerê mezhebperesiyê pêş bikev. Piştî têkçûna Esed, hêvî hebû ku hikumeta nû vê yekê pêk neyîne, lê wê jî ji zihniyeta rejîmên berê xerabtir xist meriyetê û nebû malê hemû mezheb, ol û pêkhateyên Sûriyê. Lê pêwîstiya Sûriyê bi guhertina vê yekê heye, bi taybet di roja îro de ku mezhebperestî pêş ketiye, divê were rakirin, ji ber bandorên xwe li ser hemû aliyan heye.

### Encama giştî

Di encamê de, dikarin bibêjin ku Sûriyê welatek e ku bi cihêrengiya xwe ya dînî û mezhebî tê naskirin. Ev cihêrengî dikare hem bextewariyek çandî û civakî be, hem jî di hin şertan de bibe sedema pevçûnê. Ji ber vê yekê, têgihiştin û rêzgirtina cihêrengiya mezhebî ji bo aştî û aramiya welêt pir girîng e. di heman demê de di dawiyê de, dikare were gotin ku li Sûriyê mezheb ne sedema bingehîn a şer bû, lê bû amûrek ku hem dewleta navxweyî hem jî hêzên derve ji bo berjewendiyên xwe bikar anîn. Ev jî şer dirêjtir kir û alozya wê zêde kir.

# ‘Di şerê cîhanê yê sêyemîn de bidestxistina azadiyê gengaz e’

Rojnamevan E. Pêjder Altan da zanîn ku di şert û mercên heyî yên şerê cîhanê yê sêyemîn de, bidestxistina azadiya gelê Kurd gengaz bûye û got, “Yekîtî û rêxistina neteweyî ji bo şertê heyî pêwîst e.”

**Hemza Sêvo**



Guhertinên radîkal ên li Sûriyê, bêîstîqrariya li Iraqê, êrîşên berfireh ên li dijî Îranê û fikarên zêde yên Tirkiyê hemî nîşan didin ku sînorên ku sedsalek berê hatine xêzkirin êdî derbasdar nînin. Di nava van hemû qeyranan de rola têkoşîna hebûnê ya Kurd û Kurdistanê di çi astî de ye, rojnamevan E. Pêjder Altan bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**-Wekî tê zanîn Rojhilata Navîn di nava agirê şer de ye, Kurdistan û Kurd beşên girîng in ji vê pêvajoyê, ev rewşa tevlîhev çawa bandorê li Kurd û Kurdistanê dike?**

Di nihêrîna pêşîn de, wekî ku cîhan di “serdema nezelaliyê” re derbas dibe. Hevpeymanên hêzên hegemonîk her demjimêr diguherin; dijminên duh li ser maseya danûstandinan rûdinin, desthevgirtina îro dibe sedema bombebarankirina sibe ya axa hev. Lê belê, di bin vê kaosa xuya de hewldanek pir hesabkirî, xweperest û stratejîk heye ku ji bo avakirina rêjeyek nû were bikar anîn. Rojhilata Navîn ew herêm e ku ev hewldan herî zêde tê hîskirin. Sînorên çêkirî yên ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekem ji hêla Peymana Sykes-Picot ve hatine xêzkirin, avahiyên dewleta neteweyî yên piştî Şerê Cîhanê yê Duyem hatine xurtkirin û hevsengiyên hêzê yên cemidî di dema Şerê Sar de niha di pêvajoya hilweşandinê de ne. Ev hilweşandin ne pêvajoyek xweber û xwezayî ye; berevajî vê, ew encama îradeya hêzên hegemonîk e rêjeyek nû ya cîhanê ava bikin. Ev pêvajo ku di salên 1990’an de li Rojhilata Navîn dest pê kir û bi berdewamî berfireh dibe, niha gihîştiye qonaxek ku dikare wekî “Şerê Cîhanê yê Sêyemîn” were binavkirin. Ev şer ne bi şêweyê şerekî cîhanî yê klasîk e ku eniyên wê bi awayekî zelal hatine destnîşankirin û welatên ku rasterast bi hev re rû bi rû ne. Berevajî vê, ew şerekî piralî ye ku tê de şerên bi wekalet ên girêdayî, dorpêçên aborî, êrîşên sîber, operasyonên îstîxbaratê, projeyên guhertina rejîmê û hewldanên endezyariya civakî bi awayekî yekgirtî têne meşandin. Di dilê vî şerî de Rojhilata Navîn heye û gelên kevnar ên vê herêmê - di serî de Kurd - hem kirde û hem jî mijara vî şerî ne.

Kesên ku Şerê Cîhanê yê Yekem dest pê kirin hesabên aborî û siyasî hebûn. Hilweşîna Împeratoriya Osmanî, ji nû ve dabeşkirina deverên kolonyal, kontrola çavkaniyên xav û serdestiya li ser rêyên bazirganiyê bingeha van hesaban pêk anîn. Êrîşa Hitler li ser Yekîtiya Sovyetê di Şerê Cîhanê yê Duyem de ne tenê hilbijartinek îdeolojîk bû; armanca wê ew bû ku rêyên bazirganiyê yên ji Asyayê heta Ewropayê dirêj dibin bigire, bigihîje çavkaniyên enerjiyê û hegemonyaya gerdûnî ava bike. Şerê ku îro li Rojhilata Navîn tê meşandin guhertoyek nûjenkirî ya heman mantixî ye.

Cûdahî ev e: Şer êdî li ser yek eniyê, di çarçoveyek demê de û di navbera du aliyên zelal de nayên kirin. Derketina rageşiyê di navbera Afganistan û Pakistanê de, êrîşa DYA-Îsraîlê ya li ser Îranê çend roj şûnda, û pêşveçûna hevdem a van hemûyan bi pêvajoya danûstandinên Îran-DYA re ne tesaduf in. Her tevger danîna perçeyan li ser texteyek mezin a satrancê ye.

Di nihêrîna pêşîn de, dibe ku pevçûna Afganistan-Pakistanê wekî rageşiyek herêmî xuya bike ku ji nakokiyên sînor di navbera du welatên cîran de derdikeve. Lêbelê, rastiya ku ev alozî tam di dema danûstandinên Îran-Amerîkayê de derketiye holê û operasyonên leşkerî yên li dijî Îranê roja din dest pê kirine, bi awayekî zelal nîşan dide ku bûyer ji hev ne qut in. Hêzên hegemonîk bi afirandina aloziyê li herêmekê dema ku li herêmeke din danûstandinan dikin, reqîbên xwe li ser gelek eniyan mijûl dikin û toreke têkiliyên tevlihev diafirînin da ku bigihîjin armancên xwe yên stratejîk.

Êrîşên ku ji aliyê DYA û Îsraîlê ve li dijî Îranê hatine destpêkirin, xwedî potansiyela guhertina bingehîn a hevsengiya hêzê li herêmê ne. Bi awayekî zelal tê gotin ku ev êrîş ji operasyoneke leşkerî bêtir in; ew beşek ji projeyek guhertina rejîmê ya berfireh in. Rêveberiya Trump bi awayekî eşkere armanca xwe ya guhertina rejîma heyî ya li Îranê ragihandiye.

Lê belê, bidestxistina vê armancê ne ewqas hêsan e ku di nihêrîna pêşîn de xuya dike. Îran yek ji welatên ku kevneşopiyên dewletê yên herî kûr li herêmê hene ye. Dema ku kûrahiya wê ya erdnîgarî, mezinahiya nifûsê, kapasîteya leşkerî û torên bandora herêmî tê hesibandin, ne xelet e ku meriv pêşbînî bike ku ev şer dê nebe “şerekî 12 rojî” ku dê zû biqede. Ji xwe nîşan hene ku şer dê bi axa Îranê ve sînordar nebe û dê nebe pevçûnek êrîşkar û parastinê ya tenê. Bihesibînin hevalbendên herêmî yên Îranê, qadên bandora wê li Iraq û Sûriyeyê û hebûna wê li Lubnanê, ev şer xwedî potansiyela belavbûna li ser qadeke erdnîgarî ya pir fireh e.

**-Di nav van geşedanên xeternak de kongreya niştîmanî riya xelasiya gelê Kurd ji komkujiyan e, heya ku ev yek pêkwere, mafê gelê Kurd û destkeftî werin parastin erkê ku dikeve ser milê partî, gel, rêxistin û saziyên sivîl li seranserî Kurdistanê çi ye?**

Di vê mijarî de gelê Kurd û Kurdistanê di hêla dîrokî de xwedî ezmûnek têr û tije ye. Ya herî girîng li ser berdewamî, hêstên welatparêzî û parastina deskeftiyên heyî, yekgirtiya netewî were avakirin.

Em dikarin ji dîrokê heya roja me ya îro wek e sereke van hêmanan rêz bikin;

Gelê Kurd û Kurdistan piştî Konfederasyona Med cara yekemîn di sala 1639’an de bi Hevpeymana Qesr-î Şîrîn a di navbêra împaratoriya Osmanî û Dewleta Îranê de hatî îmzekirin, ji hev hatin parçekirin.

Parçebûna duyemîn; di salên Yekemîn Şerê Cîhanê de çêdibe. Di encama Hevpeymana Sykes Pîcot a sala 1916’an de Kurdistan dibe çar parçe. Bi avakirina sînorên sinayî, eşîret, malbat, xizim civaka Kurd bi temamî tên parçekirin. Di van sînorên sinayî de, mayîn hatin çandin, bi têlên sitîrîn hatin pêçan û di roja me yê îro de jî ji aliyê van dewletên dagirker ve dîwar tên lêkirin. Di encama van hemû pêşketinan de, Kurdan dest bi hewldana yekîtîyê kirine. Û hevoka “Yekîtîya Kurdan” bûye beşek ji jiyanê.

Di serhildana Şêx Seîd a sala 1925’an de her çiqas ji bo piştgiriya eşîr û partiyên siyasî yên çar parçeyê Kurdistanê bangewazî hatibe kirin jî lê ji ber xiyaneta navxweyî serhildan neçar ma zû dest pê bike, nikaribûn piştgiriyê bidin. Dîsa di Serhildana Agirî ya sala 1931’an de di bin banê Xoybûn de Kurd hewildana yekbûna Kurdan çêbibe jî lê li gor şert û mercên xirab ên wê demî ev yek pêknehat.

Hewldanên ji bo yekîtiya neteweyî bi salan e berdewam dikin. Ji salên 1970an pê ve, partî û rêxistinên Kurdî li Kurdistanê hewldanên ji bo yekîtiya neteweyî ya Kurd dan destpêkirin û domandin. Di nîvê salên 1980’an de, hema hema hemû partî ji bo yekîtiyê hatin cem hev, û ev hevkarî di salên paşîn de jî berdewam kirin. Di sala 2011’an de, konferansa yekem a yekîtiya neteweyî li otêlekê li navçeya Suriçî ya Amedê hate lidarxistin. Kesayetiyên girîng ji civakên Kurd ên li hundir û derveyî welêt, di nav de serokên partî û rêxistinan û rêberên raya giştî, beşdar bûn. Hejmareke mezin ji partî û rêxistinên Kurdî yên ku di siyaseta Tirkiyeyê de çalak in jî beşdar bûn. Konferansa du rojî serketî bû; her çend li ser yekîtiya neteweyî lihevkirinek nehat bidestxistin jî, lê ew destpêkek girîng nîşan da. Civîna din li heman cihî hate lidarxistin, û vê carê, di navbera partî, fraksiyon û hevalbendên Kurd de danûstendinek pêşkeftîtir hate bidestxistin.

Du sal piştî van kombunan, Di Tîrmeha 2013’an de, nûnerên partîyên sîyasî yên Kurd û rêxistinên civaka sivîl li bajarê Selahedîn (Mesif) ji bo konferansekê li Hewlêrê (Hewlêr) kom bûn.

Di civînê de beşdar bûn: endamên Konseya Rêveber a KCKê Sabrî Ok, Zekî Şengalî û Ronahi Serhat; Serokê Giştî yê KDPê Mesûd Barzanî; Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzani; Hevserokê DTKê Ahmet Turk; Hevserokê BDPê Selahattîn Demîrtaş; endamên Polîtburoya YNKê Sadî Pira û Adnan Müfti; Kemal Kerkûkî ji KDPê; Hevserokên PYDê Salih Muslim û Asya Abdullah; Hevserokên KNKê Nülifer Koç û Tahir Kemalizade; û nûnerên 39 partî û rêxistinên civaka sivîl ên din, beşdar bûn.

Piştre Di sala 2014’an de di navbêra Partiyên Kurd ên Rojava û Başûrê Kurdistanê de komcivîn hatin lidarxistin.

Herî dawî jî li ser daxwazên Pêşengên Kurdan, di bin navê Diyaloga Kurdî Kurdî de li Rojavayê Kurdistanê Komcivîn hate lidarxistin.

Ji ber vê yekê, azadiya Kurdan ne tenê di berjewendiya Kurdan de ye, lê di heman demê de di berjewendiya hemû gelên herêmê û mirovahiyê de ye. Di şert û mercên heyî yên Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de, bidestxistina vê azadiyê gengaz bûye. Lê belê, yekîtî û rêxistina neteweyî ji bo vê yekê pêwîst in. Bi rastî, qelsiya yekîtî û rêxistinê di dema Şerê Cîhanê yê Yekem û piştî wê de bû sedema zîhniyet û siyaseta qirker a heyî. Divê heman rewş di şert û mercên Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de dubare nebe. Ji bo vê yekê, bi tevahî pêdivî ye ku meriv li ser zîhniyeta “Bila biçûk be, lê bila ya min be” ku xizmeta hêzên biyanî dike, bi ser bikeve û yekîtî û rêxistina neteweyî li ser bingeha têgihîştina “Bila mezin be, bila ji bo me hemûyan be” ava bike. Ev pîvana welatparêzî û demokrasiya Kurd a îroyîn e.

**-Pêve girêdayî ji bo avakirina vê nêrîn û pêşdîtinên we çi ne?**

Ji bo bikaranîna derfetan, divê çend şertên bingehîn werin bicîhanîn. Ya yekem, naskirina fermî ya Rêber Apo wekî hevkarê danûstandinê û afirandina şert û mercên xebata azad. Ev ne tenê ji bo pirsgirêka Kurd, lê di heman demê de ji bo demokratîkbûna Tirkiyê û herêmê jî şertek pêşîn e.

Ya duyemîn, xurtkirina yekîtiya demokratîk a Kurd. Gel li ser bingehek demokratîk yekîtî bi dest xistiye; Erka siyasetê ew e ku vê yekê qebûl bike û çalakiya xwe ya siyasî ya rêxistinkirî bimeşîne.

Sêyemîn, kûrkirina avakirina komunal a demokratîk li Rojava. Bi serkeftî pêkanîna modela dewlet û demokrasiyê dê ji bo tevahiya Rojhilata Navîn mînakek be.

Çaremîn, bi biryardarî berdewamkirina têkoşîna rizgariya jinan. Her gavek paşvekişandin di mijara jinan de dê hemî destkeftiyên şoreşgerî bixe xeterê.

Pêncemîn, pejirandina nêzîkatiyek siyasî ku ji nirxandinên hestyarî dûr be, kûrahiya stratejîk hebe û li ser analîzên rast ava bibe. Ezmûn û hînkirinên dîrokî yên Rêber Apo li ser vê mijarê divê bên dîtin.

Di encamê de, tiştek li herêmê dê wekî berê nebe. Ya girîng ew e ku ev guhertin di berjewendiya azadî û demokrasiya gelan de çêbibe. Ev tenê dê berhema civatek rêxistinkirî, siyasetek hişmend û têkoşînek bi biryar be. Dîrok dê kesên ku di vê xala werçerxê de gavên rast avêtine wekî serketî binivîse.



# Li Dêra Zorê piştî serweriya hikumeta demkî, jiyana gel talan bûye

Dêra Zora ku xwediyê hilberîna sotemenî, xêr û bêrên jiyanê bû, bi hatine hikumeta demkî ya Sûriyê re; tunbûna nan, sotemenî, elektirîk, talankirina qada tenduristî û çandiniyê re jiyana gel piştî derketina Rêveberiya Xweser talan kiriye.

**Esma Mistefa**

Hikumeta demkî û komên çeteyên ku xwe di nava vê hikumetê de birêxistin kirine di 18’ê Çileyê de dest bi êriş û hedefgirtina Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Ev êriş piştî êrişên li ser her du taxên Eşrefiyê û Şêxmeqsûd di 6’ê Çile de a ku berxwedana wan bû dîrok di bîrwariya Sûriyê û gelê Kurd de, hatin destpêkirin. Ji Dêr Hafir dest pê kirin û ber bi Reqa, Tebqa, Hol, Dêr zor û Hesekê ve hatin. Ev êriş li ber deriyê bajarê Hesekê sekinî û li beramber patrastina destkeftiyên Gel û Şoreşa Rojavayê Kurdistanê banga seferberiya giştî hate kirin.

Gelê ku di herêmên Rêveberiya Xweser de jiyan dikirin, di nava sîstemeke ku binasaziya wê hatibû avakirin ku jiyana gel rûxmî tevlîheviyên leşkerî û siyasî lê di aliyê aborî de rihet dihate meşandin. Gel xwe di nava sîstem, rêveberî û saziyê Rêveberiya Xweser de xwebirêxistin kiribûn û kar dikirin. Rêveberiya Xweser rûxmî hemû êriş û gefên li ser herêmê, lê dîsa jî gel di rewşeke asayî û aram de jiyan dikir ku hemû derfet ji gel re vekirî bûn, saziyên Rêveberiya Xweser xebat didan meşandin û pêşî li talankirin, dizî û bêserûberiyê hatibû girtin. Dêrezor, Reqa, Tebpa û hemû herêmên rizgarkirî xwediyê xwesertiya xwe bûn, rewşa bazirganî û aboriyê di asta herî baş de derbas dibû. Lê mixabin bi hatina hikumeta demkî ya Sûriyê rewşa wan herêman di aliyê jiyanî, aborî û ewlehiyê de xirab bû û tu kes nikare li ber ziyan û rewşa xirab a ku gel tê re derbas dibe xwe berpirsyar bibîne.

Di vê raporê de em dixwazin bi taybet balê bikşînin ser rewşa jiyanî ya Dêre zorê piştî hatine hikumeta demkî ya Sûriyê. Ev daneyên ku em bidin herî zêde ji aliyê (Çavdêra Sûrî ya Mafê Mirovan) ve hatine tespîtkirin.

**Kirîza nan û firinan**

Bajarokê Zîban û deverên din li gundewarê rojhilatê Dêra Zorê rewşeke zehmet a nan dijîn, piştî ku piraniya nanpêjxaneyên herêmî ji kar rawestandin. Nanpêjxaneya “El Cezîre” li bajarokê ji nû ve dest bi kar kiriye. Ew tekane nanpêjxaneya ku xizmetê dide xelkê ye, lê ew pêdiviyên mezin ên gel nikare pêk bîne. Ew hejmareke diyarkirî yên nan çêdike û rojê tenê du an sê saetan dixebite, ev yek berî ku bi hinceta ku ardê wê yê diyarkirî xilas dibe raweste.

Ev şert û merc bûne sedema kombûna qerebalixek mezin li ber nanpêjxaneya El Cezîreyê, û niştecih ji berbelavbûna di belavkirina nan de û mîqdarên sînorkirî yên ku ji wan re têne dayîn ku ji bo hemî endamên malbatê têrê nakin, êş dikişînin. Di vê çarçoveyê de, niştecihekî bajarokê ji Çavdêra Sûrî re got, “Li firina El Cezîreyê qerebalixiyek mezin heye ji ber ku firinên din kar nakin, û xwediyê firinê di destpêkirina belavkirinê de pir dereng dimîne ku ev yek êşa mirovan zêde dike ku ew bi saetan di bin tavê de li rêzê dimînin.”

Niştecihekî din jî got, “Mîqdarên ku ji hêla xwediyê firinê ve têne peyda kirin têrê nakin, ji ber ku belavkirin tenê yek carî tê kirin û heqê tûrekî nan 6 hezar lîreyî ve sînorkirî ye ku tenê ji bo yek xwarinê re têrê dike.

Di vê navberê de, malbatên mezin hene ku ji bo hem şîvê û hem jî ji bo taştê û Fîrtavînê têra xwe hewce ne, û ev niha peyda nabe.”

Krîza nan hîn jî yek ji pirsgirêkên giran ên êşa rojane ya ku xelkê gundewarê rojhilatê Dêra Zorê dikişînin e, di demekê de ku daxwazên berdewam ji bo vegera firinan ser kar. Her wiha vegqetandin û erzankirina ard ji bo gel da ku zehmetiyên wan sivik bike.

Hikûmeta Veguhêz a Sûriyeyê bi sepandina bacên bilind tê ku ev yek bûye sedema zêdebûna lêçûna wê ya dawî. Ev dane mezinahiya zehmetiyên ku sektora çandiniyê li herêmê pê re rû bi rû ye nîşan didin ku ev rewş binketina rewşa aborî ya herêmê û gel dide diyarkirin. Di vê çarçoveyê de gel daxwazên destwerdanê ji aliyê rayedarên peywendîdar ve têne kirin da ku piştgirîya cotkaran bikin û berdewamiya hilberîna çandiniyê li gundewarê rojhilatê Dêra Zorê biparêzin.




**Li Dêre Zorê pirsgirêkên çandiniyê**

Êşa cotkaran li gundewarê rojhilatê Dêra Zorê xirabtir dibe ji ber ku demsala çandiniyê digihîje nîvê xwe, di demekê de ku bihayên gubreyan (Semad) bêhempa ne. Semad jî yek ji stûnên bingehîn ên misogerkirina ferkeftina berhemdarî û kalîteya berheman e.

Her sal di vê demê de, cotkar dest bi kirîna pêdiviyên xwe yên gubreyê (semad) dikin da ku piştgiriyê bidin demsalên xwe yê çandiniyê ku bi awayekî baş berhem bide, lê ev demsal bi zehmetiyan bargiran bûye, ji ber ku biha ji hêza kirîna piraniya cotkaran derbas bûne ku ev yek gefê li bandorên neyînî li ser rêjeya hilberîna çandiniyê ya îsal dixwe.

Li gorî agahiyên herêmî, gubreya Îranî ku berê li sûkan peyda dibû hema bêje bi tevahî winda bûye, lê niha dabînkirin bi gubreya Rûsî tenê heye ku bihayê wê ji 600 dolarî bo her tonê derbas bûye, lê berê bihayê wê 510 dolar bû. Bi vê yek zextên darayî yên li ser cotkaran du qat zêde kiriye.

Di daxuyaniyekê de ji bo Çavdêra Sûrî, niştecihekî bajarokê Ebû Herdûb got: “Buhayê kîsikek gubre berê 25 dolar bû, lê îro ji 31 dolarî derbas bûye, ev mîqdar ji şiyana me ya kirînê wêdetir e.”

Her wiha cotkarekî ji bajarokê El-Cerdî wiha digot: “Me her sal di vê demê de gubre dikirîn da ku em piştgiriyê bidin berhemên xwe, lê îsal em nikarin vê bikin. Me hêvî dikir ku biha kêm bibin, lê ew bi giranî zêde bûne ku ev yek dê bandorek neyînî li ser hejmar û kalîteya hilberînê bike.”

Ji aliyekî din ve, cotkarekî ji bajarokê Şenan destnîşan kir ku kêmbûna buhayê berê bi kirîna gubreyê bi rêya deriyê Sêmalkayê bê baca gumrikê ve girêdayî bû, lê niha ew bi rêya derbasgehên

**Xirabûna qada tenduristî û xeteriya li ser jiyana gel**

Niştecihên devera Şeytatê li gundewarê rojhilatê Dêra Zorê ji ber rawestandina xebatên Nexweşxaneya Firatê ji rewşa tenduristiyê ya xirabtir dikişînin. Ew tekane nexweşxane bû ku xizmetên bijîşkî yên belaş ji bo hezaran sivîlên herêmê re peyda dikir. Ev girtin zêdetirî 300 hezar kes li deh bajarokan ji gihîştina bilez a lênihêrîna tenduristiyê bêpar kirin, di nav de bajarokên Ebû Hemam, Keşkiye, Granîc û El Behra.

Îro, niştecih neçar in ku ji bo gihîştina nexweşxaneya giştî ya bajarê Hajînê rêyên dûr û dirêj bi rê ve bibin, ev rêwîtiyek xeternak e, nemaze di rewşên awarte, zayîn û qezayan de ku dem dibe meseleya jiyan û mirinê. Ev rastî, ji ber şert û mercên jiyanê yên dijwar û nebûna veguhestina ewle, barekî zêde dixe ser nexweşên bi nexweşiyên kronîk, kal û pîr û zarokan.

**Bi hatina hikumetê re rewşa gel xirab e**

Nexweşxaneya Firatê berê, berî ku Hêzên Sûriya Demokratîk ji herêmê vekişin, di bin rêveberiya Rêveberiya Xweser de bi bandor dixebitî. Lêbelê, piştî ku Hikumeta Demkî ya Sûriyê dest danî ser rêveberiyê, nexweşxaneyê xebatên xwe rawestand, ev yek krîza tenduristiyê girantir kir û di sektora bijîşkî ya herêmê de valahiyek mezin hişt.

Niştecihên herêmê û karmendên bijîşkî yên berê yên nexweşxaneyê bang li Rêveberiya Tenduristiyê ya Dêra Zorê kirin ku ji nû ve vekirina nexweşxaneyê li bajarokê Ebû Hemamê bilez bike, û tekez kirin ku binesaziya heyî hîn jî li cihê xwe ye û amade ye ku bixebite, lê pêdivî ye ku alavên bijîşkî temam bike û karmend û amûrên pêwîst peyda bike.

**Banga gel û bijîşkan**

Yek ji niştecihên Ebû Hemamê got, “Nexweşxaneya Firatê ji Suweydanê li rojhilat heta El-Behra, di Ebû Hemamê re derbas dibe, xizmetê dide deh bajarokan. Em pir hewcedarê vekirina wê ne ji ber ku ew pêdiviyek mirovî ya girîng e.”

Yek ji karmendên bijîşkî got jî, “Nexweşxane rojane bi dehan rewşên zayîn digirt, ji bilî qezayan û nexweşiyên kronîk. Ji nû ve vekirina wê ji bo gelek nexweşan meseleya jiyan û mirinê ye, û em ji hemî aliyên peywendîdar dixwazin ku tedbîrên lezgîn bigirin.”

Niştecihekî El-Keşkiyê ev yek piştrast kir: “Nexweşxane heye û binesaziya wê amade ye, lê tenê piştgirî û alavên bijîşkî hewce dike. Em wekî mafek bingehîn ji bo niştecihan daxwaza ji nû ve aktîfkirina wê dikin.”

Çavdêrgeha Sûrî ya Mafên Mirovan tekez dike ku girtina berdewam a Nexweşxaneya Firatê ne tenê tê wateya nebûna saziyeke tenduristiyê, lê di heman demê de mehrûmkirina rasterast a bi hezaran malbatan ji mafê wan ê xwezayî yê dermankirinê û rûmeta mirovan nîşan dide. Ji nû ve vekirina nexweşxaneyê ne tenê pêdiviyeke xizmetguzariyê ye, lê belê bangewaziyeke mirovî ya lezgîn e ji bo rizgarkirina jiyanan, vegerandina hêviyê, û misogerkirina astek herî kêm a ewlehiya tenduristiyê ji bo niştecihên gundewarê rojhilatê Dêra Zorê, yên ku ji ber şer û paşguhkirina bi salan westiyane.

Talanbûn û zêdebûna buhaya sotemeniyê û elektrîkê.

Çalakvanên Çavdêriya Sûrî bilindbûneke ne normal di buhayê mazotê de li bazara reş dîtine, ku bihayê her lîtreyekê ji hêza kirîna kesên xwedî pereyên sînordarkirî derbas bûye. bi taybet piştî rawestandina dabînkirina mazotê ya dubarekirî û guhertina nexşeya kontrola li ser zeviyên petrolê li herêmê.

Di şahidiyekê de ku ji aliyê Çavdêriyê ve hatiye belavkirin, (A.S.), zilamekî malbatî ji taxa El-Joura, dibêje: “Meaşê min têrê nake ku 20 lître sotemeniyê bikirin; zarokên min di cilên xwe yên giran de radizin û em karton û plastîk dişewitînin da ku hinekî germ bibin tevî xetereyên dûmana jehrîn.”

Êş tenê bi kêmbûna sotemeniyê ve sînordar nîne, lê di heman demê de heta elektrîkê jî dirêj dibe, ji ber ku hikumet fatûreyên xerckirinê yên “zêde” û zêde li ser niştecîyan ferz dike, di bin bernameyeke dijwar a saetek ji elektrîkê li ber pênc saetan qutbûna elektrîkê. Di dema ku elektrîk li ser Dêra Zorê qutnedibû û cihê hilberîna sotemeniyê bû, niha niştecîyan ji karanîna sobeyên elektrîkê wekî alternatîfek ji bo sotemeniyê mehrûm bûne.

Li gundewarê Dêra Zorê, jina bi navê (Dayîka Mihemed) ji Çavdêrgehê re piştrast dike ku pereyên germkirinê hê nehatine dayîn, hîn negihîştine wan, ev yek jî xelkê koçber neçar dike ku ji bo germkirinê xwe bispêrin qutkirina daran û bermayiyan.

Hêjayî gotinê ye ku xetera berdewamiya vê rewşa trajîk û bandorên wê yên zehmet li ser rastiya mirovî ku tenduristî û jiyana welatiyan, bi taybet zarok û kal û pîran, yên ku ji ber hewaya sar û nebûna rêbazên germkirinê yên ewle, bi xeteriya nexweşî û mirinê re rû bi rû ne.

**Bîra Civakê**



Ehmed Hesen

## Zanakirina nifşên civakî ne tenê erka mamosteyekî/ê ye

Çaxa ku mirov dest bi jiyanê dike, bêguman mejiyê wî/ê weke kaxezeke spî û vala ye û ji kêliya jidayîkbûnê agahî û deng diniqutin nava mejî û hestên wî/ê, girtina van deng û agahiyên destpêkê, di heman demê de lêvkirina gotina destpêkê ji bo saykolojiya zarok gelekî hesas û girîng e, lewma jî atmosfer û erdnîgariya ku zarok têde bêhin digire jî xwedî bandoreke diyarker e, ev bandor diyar dikin ku wê ev zarok di çi pêvajoyan re derbas bibe, ya rast armanc ne fêrbûn û zanakirina zarok e, armanc ew e ku zarok wê çi fêr bibe, wê çawa fêr bibe, li kur fêr bibe û li ser çi bingehan fêr bibe. Cih, dem û atmosfera civakî bandoreke mezin li ser pêşxistina nifşan an jî paşketina wan dikin. Di heman demê de kes an aliyên ku zarok fêr dikin jî roleke wan a diyarker di zanakirina zarok de heye. Di roja îro de bi qasî ku perwerde û fêrkirinên li ser medya dijîtal zêde bûne, ewqas jî encama fêrbûn û pêşketina zarokan paşde maye, bêguman bi awayekî rêjeyî ev paşketin çêdibe, taybet li cihê ku rê û rêbazên fêrkirina zarokan paşde dimîne, li wir jî pirsgirêka zanakirina civakî derdikeve holê. Di heman demê de nebûna berpirsyariya rasteqîn a wezîfeya xurtkirina zarokan di aliyê meslekî, reftar û pîvanên exlaqî yên pêwîst ji aliyê kesên pêwendîdar taybet malbat û perwerdekaran ve, rê dide ku valahiyeke mezin derkeve holê û bi xwe re encamên krîtîk derxîne holê, ji wan encaman kêmbûna xwendinê, bê berpirsiyariya di derheqê zarokan de, karkirina zarokan di temenên ne guncav de û hwd encamên ne baş derdikevin holê. Bêguman çareserkirina van pirsgirêkan ne tenê erka aliyekî pêwendîdar e, ew berpirsiyariyeke topyekun a hemû beşên civakê ye, çi dayîk, bav, mamoste û çi jî zana û rewşenbîrên di civakê de dibin. Divê were zanîn ku bikaranîna qada înternetê bi awayekî saxlem û guncav dikare gelek pirsgirêkên zanakirinê çareser bike, lê ew bi tena serê xwe ne têrker e, li kêleka wê erkên exlaqî yên civakê dikarin werin bicihanîn û rê li ber firehkirina hezkirina xwendinê were vekirin, ango afirîneriya di xwe zanakirin, xwe pêşxistin û rastiya xwe hîskirinê de were zêdekirin. Mixabin di roja îro de çanda perezêdekirinê gelek li pêş e, taybet çaxa ku kesek li ser gaveke pêşxistina rewşenbîrî difikire, rasterast pirsa “wê çiqas pere li pişt vê gavê werin qezenckirin?” di serê mirov de digere, ev yek jî, yekdestdariya darayî pir zêde dike û zanakirina civakî dike milkê pereyan. Di heman demê de rewşên xizaniya zêde jî rê li ber vê yekê vedikin, lewra jî pêwîstî bi xurtkirina aliyê xwezanakirin û qezenckirina dûrî yekdestdariyê pêwîst dike. Hêza civakî têrê dike ku di nava tenê 10 salan de pêşxistinên herî mezin di nava qada perwerdeyê de pêk bînin, lê divê di serî de şiyan û daxwazeke azad li ber vê yekê hebe ku bikaribe di hemû beşên civakî de asta ronakbîrî mezintir û xurtir bike, lê avêtina berpirsiyariyeke wiha li ser kesan di bin navên “tenê ew bi vê yekê re têkildar e” wê encameke krîtîk di nava hişmendiya civakî de derxîne holê.